

DUGIR

Her sê mehan carekê derdikeve • Zivistana 1998an hejmarê

8





DUGIR

Hejmar 8 Zivistana 1998an.

KOVARA KURDÎ LI DERVEYÎ WELÊT
EV KOVAR LI GOR ALFABE, VEKÎT Û
RÊZIMANA
MÎR CELADET BEDIRXANÎ
DERDIKEVE

Xwedi
Kawa förlag

Berpirsiyarê giştî
Dr. Saîd Mele

Birêvebirên kovarê
Ehmedê Huseynî
Zagrosê Hajo
Yihyayê Yûsif

Berpirsiyarê hunerî
S. Rêzanî

Abonetiya salekê
200 SKR
Navnîşan

DUGIR Box: 3437
165 23 Hässelby
SWEDEN

Posteya elektroni
Zagros hajo@ avestamail
telia.com internet: w1.
226. Telia.com/~0226
0008

Tel/faks
46(0)8-6211571
46(0)706333261

Postgiro
692357- 7

ISBN: 1400-591

Çap
Çapxaneyê APECê

NAVEROK

- 2 Pêşgotin *Dugir*
 3 Goristanên teng *Ehmed Huseynî*
 12 Miletê di devê nişana tivingê de *S. Berekat*
 18 ji bo hevalê min Bozo *Mistefa Qazî*
 20 Bajarvanî *Kamîranê Haco*
 22 Kelek *Kamîranê Hirsan*
 23 Xezala Somerî *Tengezarê Marîni*
 29 Hunermendekî kurd *Fûadê Gemo*
 33 Durvên hunerî yê çîroka Mem û Zîn *H. Umer*
 57 Ji dimenên cenga mezin *Sebrî Botanî*
 64 Aramên çanda xwekuj *Nezîr Akat*
 69 Ji pirtûka xilmaşiyê *Rezoyê Osê*
 71 Baxê Gulan *Rewî*
 72 Zewaca reş a Gulîzarê *Malmisaniy*
 77 Helbestek û heft cîgeh *Alberto Giacometti*
 78 Lêvên birînê *Ferhadê Içmo*

- Nivîs eger çap jî nebin, li xwediyan nayên vegerandin.
- Ji bilî naverokê, di serastkirina nivîsan de Dugir azad e.
- Ji bilî nivîsên ko li ser navê Dugirê tên weşandin, her nivîskarek berpîrsê naveroka nivîsa xwe ye.

Berpirsiyarê belavkirina kovarê
li Almaniya û Firansayê:
Dr. Mihemed Nûrî Sulêman. TEL: 02303237367

Dugir, deh mûmên şîngiriyê bo Helebçeya
 şehîd vêdixîne û sorgulekê pêşkêşî
 reşgirêdana Newroza we dike!

Tuher deh salên sosretê,
 wekî rêzên xwelîreng ên
 çîyan, reşgirêdayî, li pey
 xwe dihêlî.

Ey gulistana bajarên
 wêranbûyî!

Ey henasa dawîn a sînga
 elendê!

Ey fireşteyên mirina dar
 û zeviyên xewnê!

Ey cirîda kêlikên
 tawanbariyê! Ey têkçûna
 mirovatiyê!

Li ser hinarkên vê sibeha
 ji dûmana zer, li ber
 duryanên metirsiya
 rehdaçikyayî, salên me li
 kulîlkên şewitî û li
 dastana goristanên
 serberdayî, dipirsin.

Dihingivin sîberên
 birîndar û li pey termê
 nêrgiza çîyan û sirûdên
 evîne, wek asoyên ji
 xerdelê, digindirin.

Li welatê xwekujan,
 wexta tu dest bi giryanê
 dikî, û esmanê dilê te jî
 hînî bîranîna mirinê dibe,
 tu hildiperikî darbesta
 serdemê û lêvên te yên
 ko PÎREMEGRÛN ji ber
 kirine, di dûmana
 derengmayî de dilerzin.
 Ey salên Helebçeya
 bînçikyayî!

Ey sorgulên ko aniha, li ser
 kêlan, dest bi aferandina
 rengan dikin!

Ey balendeyên ko êdî nema
 bêriya hêlîn û xuşexuşa
 çavkaniyan dikin!

Werin!

Werin!

Da ji nû ve, em ahenga şewatê
 vejînin û ji nû ve em navê
 Helebçeyê li ser ewrên zer û li
 ser destên xatirxwestinê, li ser
 rûpelên nalîna zarokan û li ser
 keservedanên pîrejînan,
 binivîsin!

Werin!

Da em destê mirinê ji hinavên
 Newrozê derînin û serkêşên
 govenda biharê ber bi kavilan
 û sîberan ve rakişînin.

Da em taristana çavên
 berbangê di xweliya demê de,
 di keftelefat Mem û Zînê de,
 di elfebaya xemê de, binimînin
 û salên zuha yên xewna zuha
 bi ser gerdeniya Helebçeyê de
 bireşînin û miriyên bayê sibê
 bi kefenên ji spîndar û
 şengebiyan bixemilînin.

De werin!

Van herdeh "salên ji kevir", di
 hişê çîyan de, di cergê giyan
 de,
 bilivînin.
 bilivînin!

DUGIR

GORISTANÊN TENG

“Şîniyên xwe yên giranbuha bi girî tar û mar nekin!”
“Tembiya cotkareki kurd”

L i ser textê çiyân
Bûk bû..
Di hêlîna buharê de
Di hişê kevir de
Çûk bû
Gula heft ber bû,
Lêv tenik
Çav bi xewn
Por Aza bû
Gerden ji alal û awazan bû.
MAÇEK min lê bû,
maçek bi lez
şîpya lê,
Xerdela bê ol
Lêvê min birî
Û berya wan,
Bi Sêva xelatî tevî şa bû..
Kir hewar,
Me xwe pê dada...
Newroza xatirxwestinê ye
Çejna mirinê ye
Û... me hêvî di xwe de bada...
Axîna wê.
Agir, di şeva "Zeredeşt" de vemirand.
Birîna wê,
Xwîn, di çermê 'xwedakî' çayî de
tewirand.
Movikên demê,
diyari şewata bê dûman dike,



Evînê ji ser zimanê zemînê hildike.

- şerpeze

- bîn teng

- toz girtî

Xewna tenik ji çavên "Leyla" radike...

Xwas mîna pinpinîkê

Bê şal û şap!

Can sivik mîna hehecîkê

ji buhara reş direve..

Tariyê distrê ! !

ji stêrkeke geş dîkeve..

pencereya girî derbas dîke!!

Nema şîrê Çiyan

ji berfê nas dîke!!

Ji demsalên kesk

BENDE MAÇA XWE ME..

Lêlê sêvê!!

Zivistan be,

li ser destên te diçelmisin.

Havîn be

Di gerdeniya te deduqurnisim

Û salên şor tîn!

Bê heyveke şermînî

Bê hevdîneke nermînî

Bê şadî û çandin

Tev şîn û çirandin,

û bi ser de!!

Em dibêjin Helebçe bû,

Navik û cî bû..

Gopal û rêwî bû..

Gepa nan û birçî bû..

Firek av û tî bû..

Tarîbûn mijankê welatê min kil dike.

Baskên buhara birîndar
nêçîra kewê şareza.
Nalîna bi çar çavkanî
Bindestiya bi qeremûşk
Jîna gergerînok
Taya mirinê û çend bîhok
Rêçên azadiyê bi mijê boyax dikin..
SÎNGA ROJHILAT BI MAÇA MIN DAGSDIDIN..
Hezar dijmin
ji dara xwîna min tên weşandin:
Berî didin
Asêbûna nifirê
Vezilandina şevnemê
Li ser aniya porkura min.
Berî didin:
Dîwarê bêdengiyê
sema agirê min,
Hinarkên kulîlk û çivîkan,
germ dikin
bi rondikên Helebçeya min.
Li dor kezeba wê keviz digre
Mûzîka xweristê.
Kom dibin pêlên tevzînokê..
Bo wê serê çiyar dişke
Bo wê çira rêwiyan dişke
Bo wê, diçurise, li ser tava rokê
xwîna kevokê..
Xuşexuşa çeman pûç dibe.
Jena dilê çiyar radiweste.
Û Helebçe
Bê dest e
Xwe davêje çepera jînê,
Xwe davêje
genîbûna birînê..
Xwe davêje,
Dilê Memo duguvêşe..



Gavên Siyamend bi ser xwede dikêşe..

Biskên Şêrînê ê

Pizota Zînê dimêje

Xwe davêje perya Ferhadê hunermend

xwe davêje, qirşikên evînê

û vediciniqel!

MAÇA MIN, Û PEYMANA ZEMÎNÊ TÊN BÎRA WÊ

HELEPÇEYÊ û dawiya şevê
bi hev re zîz bûn..

rewanê wê

"Izrayîl" û diranê wê

bi ser hev de xwîz bûn..

Li nik sipîka çavê wê

ro şerpilî.

Tava xweşyê haş bû

Lehiya reşiyê ser û kaş bû

Stiranên baranê

Zigilê beranê êvarê

Xwe sipartin qurmê hinarê

Bazî li ZÊWEYÊ

Hêlînê dipekîne..

Serçavka QELEDIZAYÊ

bi hêrs direvîne.

Şev bê dê ye!!

Li derveyî demê ye!!

Hênikahiya bayê sibê ye!!

Dil li ser balgeha kîjan kêrê ye?

Berê rokê li kîjan gorê ye?

Û bareş xwe li ba dîke,

Pênc hazar gul.

Pênc hezar peşkên baranê

ji xewna çiyar şiyar dîke..

Û BAVÊ TÛJO

Ji esmanê şehîdan direve!!

Û HELEBÇE

Nexurya çiyân
Ji zîkê kevir
Ji ava gulân têt herikandin..
Bi mekyaja kîmya nûjen
têt xemilandin..
Bîna wê ji çermê me
Ji MAÇA MIN difûre
Cîhan pêl axê dike
dişikim!!
Bi navê diktatoran
Bi azara deyûz
Dibawîşkim!!
Û jena dilê min bi ser
pêşanîka Helebçeyê de
têt reşandin..
Rût...
Li ber tîna agirê me
Serê rîman ji xwînê dişon..
Her tiştê xweşik talan dikin
Hemî sibehên nazik bêcan dikin
Xwe fêrî navê şûr û topan dikin
û Helebçeyê
Lêvên xwe ji nêrgîzê
Ji tava rokê bernade...
Ko ne li ser memikên berbangê be
tiliyên xewnê ranade..
Ceng bo wan e!!
MAÇ oksejêna Helebçe ye!!
Û ji govenda seqemê nareve..
Ji guregura mirinê
ji zîdana çiyân
ji ser piyê ewran nalîve
DOZA WÊ MAÇ E
an mazûbanê wê
xerdel e, sêdar û xaç e



Esmanê şîniyê têt vegirtin,
konê reş, porê Helebçeyê
şil dîke.

-Paşmêr

-Dîroka şelû.

bi rûpelekî reş

ARARAT dinixumînin

NEHIŞYÊ MAÇA BÊTIRS IM

Li hember mirinê şox û gîrs im

Û tê lorandin:

-Bi bayê ber tavê.

-Bi çariya lavlavê.

-Bi hişkiya Silavê.

Sorgula min.

Sosreta min.

Derbesta min.

Darbesta min.

Ku dûr bim

Bilûreke bêhiş bim,

Bo çavsoran çûr bim

Û ji nişkê ve,

Giwîzan û devê şûr bim!!

Da tu li ser zendê vebîşirandinê

xeweke zelaî derbas bikî

kaniya şiyar bûnê me lêl

Da goşiyên tirsê ji rezê dilê te bidime hev

xwe bi mêranî didim nasîn!

Da rexên pîrsê li ser lêvên te bipîvim

Cav bi gav xwe disrpêrim MAÇA te !!

Bajarên evîna te.

Bi ronahiya çav vêdixim.

Bi te dikevîm!

Mîna pilopilo

Mîna kêzika hecê.

Mîna serê derziyê

te di bin çermê dil de vedişêrim.

Keskesorekê ji kovana çiyân.

bo te hildibijêrim...
Helebçeyê!
Eger tu keça hîman bî
Neviya berf û qeşan bî
Gera can û rewan bî
Mey û helbestek GORAN bî
Dê bên bexçeyên mirina te!!
Ji felsefeya axê
Ji perwaneya li dor çiraxê
Dê bên,
Ji hûrê deyaxê
Zingil di dest wan de
Kevok di mil wan de
Dîrok di dev wan de
Xerdel di zik wan de
Gula heft ber
Di xêz û saz û hiş wan de.
Tu yê bibêjî:
Hûn çi divên!?
Simbilên MÎDYAYÊ zer bûne
Mertalên RESTEM kerr bûne
Pizikên SELAHEDÎN der bûne
Û!!
Hesrata Cegerxwîn
Destgirtiya Hêmin
FERATê seranser xwuşîn
çav zelal û şîn
Şerbikê bûkê
Şoreşa enîgirêdayê
Welatê gulperîn divên!!
Welatê dil xemgîn divên!!

Ji paytextên xweliyê,
Ji EHMED ARIF
Ta dilovaniya zencîrên kevn.
Ji pêlên riha ŞÊX SEÎD



ji cama qirika wî
Ta sînorê mizgînxêra Zûhayiyê...
Ji bejna Zozik
ji hina simbêlê SEYIDXANÊ KERR
Ta sîle û pêkenîna bayê...
Ji giwîzên dilrevîn
Ta xwêdana pişta NEMRÛD
Ta peqên zimanê min
Hustxwarkirina tîp û stiranên min
Ta kilîta buhiştê
Ta dismal û qermîçokê dilê dayê..
Ji bîranîna te,
Ji sersala te,
Ji berfa sor.
Ji sibehên zerikî,
Ji naveroka êşeke tîr - pîr.
Ta biservebûna şopa tayê..
Te dinivîsim Helebçeya min bi ava payê...
Çend sedsalan te guvaştin
te kuştin!?
Çend caran MAÇEK bo min
li ser gula xwîna te nehiştin!?
Çend lehî, xwînrijî, te vexwarin
Çend singoyên rizyayî
ji destê felekê, te xwarin!?
Helebçeya min!
Iê moxila vê serdeşrnê.
Dizê hêlîna bêguneh Kî ye?
Dengbêjê hilata rojhilat Kî ye?
Kurm û tîrşahiya roj felat Kî ye?
Neynika çavşikestî Kî ye?
Helbestvan Kî ye?
Pê zan?
Ezbervan?
Bê çend zindan te li xwe girtin?
Bê çend koremaran bi te vedan?
Bê çend kilîlên bûkaniyê te guhertin?

Bê çend berfan sînga kewan himbêzkirin?
Bê çend hesp û kevanan.
Bê çend tajî û nêçîrvanan
di qafê berbangê de te genî kirin?
Te dinivîsim Helebçeyê
bi ava payê...

Îr0!!

Ji qada berûyan
koça xwe bar kiriye oksejênê!!
"EHMEDÊ MALA MÛSÊ yadê min dixwaze û min nadinê!"
Goristanek dirêî e
li dor xewna te ye
Helebçeya min
**"Hey ho li me xerîbê! Bê rizq û nesîbê
Xerîba xwedê mo. Tara li devê rê mo
hesreta mala bavê mo"**

pêt û ar û tirêj e.
Li dor newqa te ye
HELEBÇEYA min.
Tava te kezyan dihûne
li ber dengê balefiran,
Mistek ji stiranên bêriyê
li kerbela dilê te diçêrin
di dojeha MAÇA min de
Tama axê tal dibe.
Rezen şîniya giranbuha
Nexşeyên eşqa bê reng
Helbestên girî û hawarê
Hinarkên Helebçeyê diqelêşin..
Rêçên ji toza sermest
Gundên bê navnîşan
Aso ji tovê hejîrê dikêşin..
Te li dor govenda mirinê dicivînin..
Bêhişiya xerdelê bi pola çavan dimeyînin..
Te ji afatiya mirina bê tembî direvînin.



**EHMED
HUSEYNI**

13. 08. 1988
Qamişlo

SELÎM BEREKAT

Vê carê, dê mirîşkên xwe,
berxên xwe û dê şan û
deqên xwe yên kurdiyane
bavêjin ser milên xwe û
ber bi Ewropayê ve biçin.
Û nijadên dîtir ên jînxweş

jî; dê sedemên vê lehiya mirovî ya ko
di zivistana cîhanê de dest pê dike, dê
di stûyên hevûdû xînin. Û pişt re dê çi
bibe? Serê xwe neêşînin, kurd in, ji
ber zorbaziya leşkeran, û zorbaziya
pêdiviya bo dîmenê; dîmena ko gerek
paqij bimîne, direvin.

Di vî warî de tukes nikare destê xwe
ji rêberiya tawanbariyê bişo, hemû
hevbeşên(şirikên) vê ji paş de xapandinê ne, ji Qumê hetanî
bigihêje Xaniyê Spî yê li

Waşingtonê.

Soz û peymanê hevbiratiya di
ayînê(dîn) de dane yê kurd lê
zimanê wî riswa û bêrûmet kirine.


Soz dane yê kurd ko êdî piştî
hilweşandina zorbazî û stemkariyê,
dê li hemberî yasayê(qanûnê)
serkeftinekê bi dest wî xînin lêbelê
yê kurd di dorpêckirina nenas de
hiştine.

Soza dadperweriyê dane yê kurd;
dadperweriya ko dê wî mîna
hevbeşekî li çarenûsa wî ya windayî
vegerîne lêbelê çek û alavên cengê bi
ser dijminê wî de barandine.

Herifandina desthilata Iraqê nediket
bîra -û ne jî dê têkeve bîra- pişgirên



**MILETÊ
DI DEVÊ
NÎŞANA
TIVINGÊ
DE**



rizgarkirina Kiwêtê.
Ew bi xwe hatin herêmê
da Îraqê vegerînin
şikeftê û dergeh jî di
dest xwe de bihêlin da
ko, bac li pey bacê,
oqyanosa petrolê zuha
bikin û bi wî samanî ji
nû ve gemiya cengê û ji
nû ve laşê leşkerê
rojavayî durist bikin.
Kurdê ko ji xewna
rizgariyê re dilîland
hate xelat kirin û Îraq

bi xwe jî hate xelat kirin: Yê kurd vegerandin labîrênta
pevçûna di valahiyê de, û hevbeşê wî li Sedamî
vegerandin, da ko hêviyên wan bi tevna ji birçîbûnê bêne
dorpêç kirin, û perdeya tenik hêdî hêdî bi ser cîgehê
veçiryayî de hate berdan.

Meydana mirovê kurd mîna baweriya wî ye: Neh rexên
zemînê hene, qenebe ji rexekî, alîkariya ko hebûna wî
biparêze dê bigihêje. Û bi rastî jî gihîşt,
alîkariya kuştina wî gihîşt.

Îrana olperest dê tevgera miletekî cîran ko rehek ji rehên
giyanê wî dirêjî îranê bi xwe dibe, her û her napejirîne; dê
tucarî jî bi çavên hevbiratiya li ber destê Xwedê li vê
tevgera wî temaşe neke.

Dê her carê desteyekê ji rihên miftiyên ko, dizanin çawan
cihêxwazan sucdar bikin, diyarî wan bike.

Û Tirkîye jî dê ji dergehê "himbêzkirina" valahiyê
derbasî nava dîmenê bibe; valahiya ko mîna textê
jînanînê, rojavayê ko terazûya(mêzêna) 'itaran
hildigire, jê re amade kir.

Êrîş li pey êrîşê dê cîgeh tar û mar bike û bide pey
labîrênta ko ji hinavên hebûna wê ya nediyar
hatiye afirandin. Şûşeyeke rojavayî ye û zeyteke islamî di
hindirê wê de ye û xwarinçêkerek wê dibe metvexa xwe ya
perde girtî, û firax tarî.


Tirkîye wexta ko di meydanên gulebarandinê de giyanê
mirovê kurd ji xwe re dike pêşangeh, dê xelata xwe ji
rojawa bixwaze, xelata xwe ya ji boyî rola pasvaniya



dîwarên rojhilatê, û ji boyî serkêşiya wê ya di warê serrastkirina bûyerên ko, ji ber neguhdana rojava û tevliheviya siyasetên rojava li Kurdistanê ji yasayê hatiye valakirin, derketine. Dê Tirkîye bizanibe ko helwesta rojava ya bi mebest û plankirî ya li dijî serbixwebûna kurdan, piştî

valakirina Kurdistanê ji Sedamî, ko ev bi xwe diyariyeke ne eşkere ye bo wê. Lewra dê hewl bide ko vê diyariyê bi awayê têkçûnê ronî bike: pêwîst e ko ez vê tevliheviya bê ser û ber rawestînim û valahiya yasayê himbêz bikim. Dê Tirkîye li ser rewşa xwe ya eşkere wisa bibêje.

Diyarî jî bi lêmiqatebûneke dijwar sextekirî ye. Digel ko rojava bi mebest guh neda ezmûneya (tecrube) kurdan û ne jî hewl da ko vê ezmûneyê bi alîkariya aborî, îdarî û bi pend û şîretên plan û projeyan, dolmend bike, di gel vê em dibînin ko stûnên hêza hevbeşa Natoyê ji çekên Elmanyayê ava dibe, û Emerîkayê jî çavên xwe li mavên mirovan û şaxên wê yên serberdayî û bêhiş yên ko di bin çengê keça wê ya delalî de diqewimin, digire, û wê ber bi Israîlê ve dikişîne da ko çareyekê ji nasnameya wê ya ko di rojhilata tarî de hatiye derizandin, bibîne. Li vir eger fikir li biranên(burhanên)zelaltir bigere, em dê bibînin ko xwarina herî paqij a ko laşê rêxistinê pê tekûz dibe li dijrawestana Yekîtiya Ewropayê bo endametiya Tirkîyê ye. Li vir her ko Tirkîye, di guftûgoyên demsalane yên endametiya rêxistina xwe de, ber bi koşeyêke dûr ve dehf didin, Tirkîya jî radibe ser piyan û dest bi gazinan dike û li ser neheqîya ko lê dibe dipeyive, general û kolanên wê yên nixumandî di van gazinan de hevbeş in. Lewra berê xwe dide tolgirtinê; û tola xwe ji milletê kurd ê ko, jînameya xwe bi zimanê xwe dixwaze, distîne; çinkî hê di



bin siya qanûnê de
nasnameya Ewropayê
wernegirtiye,
newergirtina vê
nasnameyê jî kuştinê
berfirehtir dike.

Himbêzkerin, ev peyva
ko mîna agahdariya ji
keşeya tolgirtinê bo
semta cîhan hatiye
pêşkêş kirin, wexta ko
pîrs bibe pîrsa mirovê
ko nasnameya wî têt
riswakirin, û

mirovatiya wî jî têt bêrûmetkirin, wê çaxê çareseriyek ji
taybetmendiyên wê re têt dîtin.

Zorbazî nayê himbêzkerin.

Zorbazî rexne dibe, rexneyeke ko piçekî wijdanê xwe pê haş
dikin, lêbelê himbêz nabe.

Yekîtiya Ewropayê dikare Tirkiyê, bi awayê ko wê di
rêxistina xwe de himbêz bike, ji astenga wê ya qederiyanê
birevîne.

Wê wextê dê laşê Tirkiyayê hînî xwîna çavdêriya dijwar a
dezgehên Yekîtiya Ewropayê bibe, herwiha dê reh û
damarên wê jî xwe li gor daxwazên hevbeşiya peymanê
rêxistinê, biguncînin. Lêbelê hewldana avêtina barê
bişûndexistina revandina Tirkiyê ser milên diroka
Yewnanê ya ko di gel bîrûbaweriya ji destçûna
Kostantînpola wendayî li hev nake, ev hewldan ji alî tevî û
ristina xwe ve pir lawaz e.

Helmut Kol dê ji bo ronîkirina vê astengê nivê rastiye
dibêje: Tirkiye mislman e. Ji bo serrastkirina wateya vê
hevokê dê şewirmendê Ewropayê Den Brock şiyaneke exlaqî
terxan bike û bibêje: Li Ewropayê yanzdeh milyon
misilman hene. Nivê mayî yê rastiye jî di navbera pişgiriya
Kol yan a Brok de dabeş dibe..

Îca roja yê kurd jî di vê koraniya bêrûmet de hiltê; mîna
piştîyên pûş li ser serê keçên bêhêviyê û dayikên wan
hilgirtî, hiltê. Dayikên ko di pevçûna "mayî ji bo yê çêtir
e" li ser xaka ko bi valahiya hêrayî wêranbûyî ye, talana
berfireh û dolmend, dizên.



Di vê bawîbûna exlaqî
de hemî wekî hev in, tu
kesê mafdar nîne, yan
jî tu kes nikare hincê
rastî û maf çêbike. Lê
nîvê gazinan dê ji
partiyên pevçûyî yê
kurdistanê bê kirin, ev
jî rast e, heq e, lê
rastîyeke lawaz û ji
hevketî ye.
Ma qey ji kurdê ko ji
hevbeşiya hebûn û
amadeyîyê bêpar

hiştine, bendemana çî dikirin?

Û bi kîjan cegerdariyê ji kurdê talanbûyî dixwazin ko bibe
nimûneya herî zelal a nijinandina bayê kurdistana
perçebûyî?

Tovên "Ezmûneya kurd" di zemîna ji kevir de ko nayê
çînîn, bi lawazî geş dibûn.

Ji bo yê kurd jî pangavek ji lêwlebûna pêwîst peyda nebû
da ko tê de bi cî bibe û şarezaiya xwe ya di warên rêxistinî
û peywendîyan de hilbijêre, damezirîne.

Xewneke xwexapîn bû; di hilatina bi lez ya hêviya têkçûna
Sedamî de ji dayik bû.


Asêgehine bê dergeh xwe spartin sozên rojava yê
parastinê; parastina ko pişt re dê bigihêje û dê "Pasvanên
Komara xwînê" vegehin "Xaka Azad".

Parastina di çarçewa gotinê de,

Parastina ko bi mayîna Sultanê tirsnak re lihevhatî ye.

Parastina bêyî ko rojava rê bide kurdan da derfeta
rehdaçikandinê û xweparastinê bi dest xînin, bêyî ko
hokerên jiyanê ji wan re peyda bikin û stûnên sînaeta biçûk
xurttir bikin, û "Parêzgehê" ji abloqeyê bi dûr xînin;
abloqeya ko qezencên qulên baca (gumrika) wê dê bibin
çîskên şiyarbûna ji xewnê.

Herwiha "Parêzgeh" bi xwe jî, bi xwespartina çewtiya
rehdaçikyayî ya parastinê û wateya wê ko li ser tîlên
cîlûştina leşkerî li Încîrlîkê raxistinê, qulên wê pirtir bûn
û di wan qulan re qasidên cîranan dest bi serdan û hatinên
xwe kirin, û sozên wan jî hergav sozên "piştî bi dawîhatina
rewşa ewarte" bûn.



Îran, desthilata Bexdê,
û Tirkiye jî, li ser
hilweşandina
avabûna laşekî nû bi
hev re û bi mijûliyeke
bêwestan hatin
bişaftin; laşê ko belkî
pêvajoyekê ji xwe re
bibîne û taybetmendiya
Kurdistanê bi xweşiya
mafê mirovî di
hebûneke dadmend de û
dûrî zorbazî û
stemkariya dorhêlê,

biafirîne.

Zorbazên ko bi dilreqî destên wan dirêjî wî alî deryayên
cîhanê dibin da ko cihêxwaz û azadîxwazan bikujin.

Ji bo hilweşandin û çewisandina daxwazên avakirina laşekî
kurdî sedem wek tiriye çiriya paşîn baş stewiya ne.

Di şûna wan de jî daxwazên parastina regez serî hildidin.

Tirkiye, bivê nevê, bi amadebûneke ewrupiyane, li derveyî
çavdêriyê ye.

Îran jî bi hemî berjewendiyên xwe di rolên herêmê de xwedî
cî ye.

Û sibê jî dê Pasvanên Komarê (leşkerên taybetî yên Sedam
in) li parêzgehê vegerin.

Îca yê kurd dê çi bike ji vê rastiye; rastiya ko di çolistan
rût de ya ji bayê hesinî, wek serçavka Aliksander Domas a
hesinî, serê wî dorpêç kiriye?

Û ji dema ko hebûna vî milletî bûye peyama dilxwaziyên tirk
û ereb û eceman, her beş, reh, êl, binemal, tîr, xwe davêje
parastina ewliyakî derewîn da ko talanan ji aqilê yasayê ji
dayik bike.

Ji vir revyayî ye. Ji wir revyayî ye.

Ji Bexdê ber bi Tehranê ve direve.

Ji Tehranê ber bi Bexdê ve direve.

Ji Enqerê ber bi Şamê ve direve.

Sêkoşeyeke leşkerî ye, her desthilatek wê ji bo tirsandina yê
din bi kar tîne.

Û ji bo yê kurd jî, eger serî hilda, tu çare nîne, ji bilî ko li
kelekekê siwar bibe û berê xwe bide oqyanosa avê.

Ji bo hevalê min Bozo



MISTEFA GAZÎ

Li wir, li derve
ji welatê xwe dûr!
Rewşa jiyana li surgûniyê

Helbet ez jî zanim.

Dizanim helbet, êşên ku di dilê te de reh berdane,
Erê hevalo!

Malmîrata dewranê, çi dewran e!

Qey riya xwe şaş kiriye,

Dîsa rîka xwe li me girtiye

Hê jî dawîya riya xwe ya şolî neaniye.

Û dawîya heyama talanê jî nayê!

Hewqas wextên bê hêvî

Hewqas êşên hesretê

Û bi ser de gava ku hewqas hêvîyên talanbûyî difikirim

Û gava ku diya xwe ya ji bişirînê bêparmayî difikirim

Ez çi bibêjim nizanîm!?

Hindik maye biteqîm!

Erê hevalo!

Nizanim tê bîra te

Kuçeyên Diyarbekirê

Pişo Meheme

Û Rasta Şêx Meheme

Hela Qahwa Tulux a wexta me ya lîseyê

Meskenê qûşbazan bû, te dî!

Û yê diz û dermankêşan bû

Li Derê Ruhayê me volta diavêt,

Hela bi şev, çi xweş dibû wê derê

Û agirê Newrozê li ser

Birca "Yedi Qardaşan"
Em hê bûtikên biçûk î teze bûn
wê wextê
Di hişê me de bi sedan fantazî
Di dilê me de jî hezkirineke ne bi dizî
Û em carna rêwiyên şoreşê
Erê hevalo
Pir tişt hatin guhertin li vir,
jirgî tu çûyî
Me faşîzm dît
Ango zulma reş
Em binketin, êsîr ketin
Hiç îzaheke din jê re tuneye, birê min!
Lê bizanibe
Her ku em binketin
Hewqas jî em hatin sûyîn
Her ku em hatin sûyin,
bêtir em gehîştin
Erê em bin ketin,
lê em winda nebûn
li welatê xwe yê derya xwînê de
Em fêrî zîlavêtinê jî bûn.
Diyarbakir, 1988



Modet. M. Fî

Pişo Meheme: Keleşekî mêrxas û navdar e ji keleşên Diyarbakirê bû
Rasta Şêx Meheme: "Şêx Meheme Duzlixî" Meydaneke di goristana Derê Mêrdînê de ye. Berê cihê çeqokêş û araqxuran.
Qehwa Tulux: Li ser kolana Mêlik Ehmedê nêzî Derê Ruhayê qehweyêke navdar e.
Ben û Sen: Birçek ji bircên kela Diyarbakirê ye.
Birca Yedîqardaşan: "Birca heft bira" Ew jî ji bircên kela Diyarbakirê ye.

Bajarvanî

- Hiş! Xwedê nehišta, xalê we raza ye... Dengê nizim ê xwişka wî kete guhê wî, xwe netirand, lê nema xewa wî hat. Lihêf ji ser xwe avêt, çavên xwe vekirin, nerî ko xwariziyên wî li dora wî civiyane, bi wan re beşişt, wan jî, ji fediya berê xwe guhertin...

Axaftina xwişka wî bi derbasbûna wê re hat:

- Van xwedê nehišta nehiştin tu razeyî, ez çiqasî bi wan de xeyidîm jî lê bê çare bû...

- Zarok in, li wan negire.. Qehweke me çêke...

- Ma tu taştê naxwî..?

- Sibeha ji qehwê pê ve ez tiştêkî dî naxwim...

Bi van gotinan Ehmed xwest bide nîşandan ko mêrik bûye bajarî û qehwa sibehê jî nîşana vê yekê bû. Ji neçarî xwişka wî qehwe çêkir û jê re anî.

Ev serê sê salan e ko Ehmed ji gund bar kiriye û çûye bajêr, bajarvanî jî lê xweş hatibû. Rabûn û rûniştina xelkên bajêr jê re rast xuya dikir, degelî, paqijî, zanebûn, têkiliyên bi sînor, û dawî vexwarina qehwa sibehê...

Qehwa xwe vexwar, dilê wî hate girtin nema dilê wî çû xwarinê, ji xwe berê jî di dilê xwe de gotibû ko ew naxwe...! Xwişka wî pê ve ma, lê wî xatir jê xwest û ji bo serdana pismamê xwe, berê xwe da gundekî dî...

Rojeke ji rojên biharî yên pir xweş e, dexla şîn vî alî û wî alî rê dixemilîne, sinbilên dextê avis bûne, xwisiya sibehê li wan ketiye, rûyê wan pelên kesk şil kirine, bayê ko li wan pelan dixîne bi hêwabûn ji nav dertê û li rûyê Ehmed dixê, ew pir kêfweş dibe... Ji dengê çûk û çivîkan û dengê piyên wî pê ve li ser axê tu dengên din nayên. Bayê paqij bi kûrbûn dikşîne, kêfxweşiya wî bê sînor bû, nema zanîbû gelo ew bi rê ve diçe yan jî per pê ve çêbûne...!?

Vê rewşê bajar anî bîra wî, toz û dûman, qerebalix, çûn û hatina bêsînor, ev ên ko mirov nexweş dikin... Li vê yekê rawestiya û gund li ber çavê wî xweş bû, bêriya vê tenêbûnê û dîtina xweristê û bayê paqij kiribû... Lê dîsa jî bajarvanî lê xweş hatibû...

Giha gundê dî, dostekî wî li pêşiya gund gihayê û ew bire mala xwe ... Dengê xwe li pîreka xwe kir ji bo ko xwarinê hazir bike, lê Ehmed bi sûnd û telaqan ew da

bawerkirin, ko li mala xwişka xwe xwariye. Di dilê xwe de dizanîbû ko ev êdî ji bermayên gundîtiyê ne, lê hîna hinek pê re mabû û bajarvaniya wî hîna qelsî tê de hebû.. Erê birçî bû, lê ew jî nizane kê bersiv da, Ehmedê bajarî yan yê gundî..!

Ji wir rabû berê xwe da mala pismamê xwe. Ji ber ko pir birçî bûbû, bi rê de ji xwe re got, ko wê xwarinê li wir bixwe. Pismamê wî jî di temenê wî de bû, zarokiya xwe bi hev re derbas kirine. Bi dîtina hev pir şa bûn, xwestin xwarinê hazir bikin. Lê Ehmed ji nişka ve axivî:

- Bi serê bavê te, min li mala xwişka xwe xwariye û niha jî min tişteki sivik li mala hevalê xwe xwar, hema qehwekê çêbikin bes e... Li van gotinên xwe pir poşman bû, ew ma li hêviya ko careke dî bibêjin, lê gava ko careke dî gotin wî dîsa ew bersiv da.. Dîsa di dilê xwe de got ko pismamê wî wê careke dî zorê lê bike, lêbelê xuya bû ko gundî jî hinekî pêşketine, lewra cara dî nehat û nehat.. Ji ber vê yekê jî xwest ko zû here mala pismamê xweyî dî, da ko bigihe firavînê.. Lê mixabin gund hinekî dûr bû û ta ko ew giha wir, dema firavînê lê çûbû... Wan xwest ko xwarinê hazirbikin, lê dîsa gotinên Ehmed bêhemd pê re derketin:

- Bi serê bavê te min niha xwar û ez hatim, ma ezê fedî bikim, ma hûn bawer dikin ez ji mala pismamê xwe bê xwarin derkevim.

Qurqura ûrê wî û birçîbûna zêde hêviyên wî çêdikirin, ko wê careke dî pirs xwarinê bikin... Lê çî cara ko ev pirs dihat, wî jî eynî bersiv dida, wî nema zanîbû, ka kî ye yê ko vê bersivê dide, lê xweş diznîbû, ko ne ûrê wî ye, yê vê bersivê dide...

Xatir ji wan xwest û berê xwe da bajêr. Ta ko giha roj çûbû ava, berê xwe da firna nê, du kilo nanê firnê kirin û berê xwe da malê... Hê bi rê de wî du nan xwarin û ko giha bi lez ji kebanîya xwe re got::

- Zû ji min re xwarinekê hazir bike, ez ji nêza û fedîya mirim..!!?





KOLÊK

Sirebayek ji çavên te
Û newqa te ya ko di destê min de difire.
Kêfxweşî min dişewitîne
Û esman jî li ba dibe.
Qereçiyê ko di dilbijandinê de pîr bûye,
ez im
Û yê ko bi pînpînkên di ser dev re çûye,
dîsa ez im!

Îca ji bo çi mîna stêrkan
ez û tu bi hev re nafirin?


Di dilên me de ronahî
Û di destên me de mûm.
Ji bo çi em nafirin?
Rojên me kulîlk in
Çavên me mermer in
Destê xwe
Û maça xwe diyarî te dikim
Bi şîniyan girêdayî me
Wek pelên payîzê
Wiryayî
Li ber destê bagerê
Bi seqem û zerbûnê tême lêdan. .



Kamiran Hesan

DUGIR, deh mûmên şîngiriyê bo Helebçeya şehîd vêdixîne
û sorgulekê pêşkêşî reşgirêdana Newroza we dike!

KEZALA
SOMERÎ



TENGEZARÊ MARÎNÎ

Bi tenê...

Da ez, bi navê te bixurrim.

Birîna şûnwarekî bêhedan, kofiyên xerzanî, tîne dîlanê
Rabe dîlbera min!

Şevçiraxa heyvanekî sînddayî ji "Du'aya serêşê"; ji Kaniya
Spî, veneqetîne.

Bila ez,

bibim nêçîra bîstikeke pûşt.

Ji wê çirisandina xemgîniyê, çixareya xwe, hişyar bike.
Keldûmana ahînen rûbarê te ye.

Keskahiya mirinê, dijene.

Nêzîkî min in, ew indeko.

Sih û neh, ji lawîja qedere re, dikim qêrîna berfê.

Deng ji nişka ve, ji xewnên serfîldana pencerê, rû didin.

Ji nalîna du mindalan, ev deq; dibişkive.

Nûjeniya pîvazê, yariya sêwlekên ji hinavê...

kolanên bê sultan,

xemsariya bê nav û nişan im.

Dergehê nivistinê ye,

wekî tîrêjên rojê, vedimire.

Razên şevê ne,
windabûna xaçerêkên sermedî,
di dilopa xunavê de ne.
Kahinên dahênanê, bê lebat in,
di asoyên dînîtiyê de.

Ho SALEHÊ...

Bextik li te biqulipe.

Bi dilxweşî, tiliyên min,
li xizêmokê, li wan şiharan, gok, maç dikirin.

Te, ew reştîr, mîna reşçiyayekî,
bi ser min de, berda.

Di wê rojê de,

şikestina min a yekemîn hate neqîşandin.

Mixabiniya min a ciwan,
tiriha da,
reng veda.

Dîmenên pêlavan xwe di dêmên min de,
çandin.

Ev nîvê min e, Kubara min.

Lerza welatekî ji mijê,

Dê bigihin hev, em?

Dergehê serxweşiya min,

li ber şeva,

ko zuxurên xwe wînda kirine,

davan vedide.

Xwîna spî ya kîjan xwedayî yî tu?!

zingilê gumanê, mestbûna te beşdar dîke.

Hûçkên lêvên te melûl in.

U.. ez biyan im dîlo, biyan im.

Em, li ser rev û qirkirinê,

perwerde dibin.

De ka ji birûskê, sêvekê, bide min.

Li ser derfeşa xwedê, bêdengiyê, xelat dikin:

Sirûdên rewewkê ne,

wekî dîrokê bê xunav; girfî dimînin.

Li ser peykerê rondikan, bendewarê we me.
Ji xapên Orfios, fîxanên te, disincirin.
Weha ez, hatim Çengezêrînê min.
Bê xetîre, li Kelehê vegeyriyam.

Çi oqyanos e, dilê te?!
Bihar e?!

Bendewariya qurbanan dikî?
Rabe serxwe:
Tu hetîketiya min a bê nav û nîşan î.
Dîwarên ketî ne, dilê me.
Bes e, bes e,
dîwarên ketî ne dilê me.
Ev zeman bi kû ve diçe?
Pesindana reşbîniyê ye, şepala min.
Li wir, devera dil, tê xapandin,
ahînen xwe, diverêsim.
Min rêça bajêr, winda kir.
Pozê xwe, hilnede.
Ez te xezalek e Somer î, li pêş xwe, dibînim.
Tiraf e îro kenê te.
Bi nazdarî, awirên te, himbêz dikim.
Cara yekemîn bû, bi xil û xavî..
ez, hingivtim jixwebiyaniyê.

Li wî dergehî, li biyanistanê,
baqê gulan, Ji xwe şerim kirin
û min jî şerim kir.

Wisa melûl.
Wisa biyan.
Wisa ciwan,
şikestin li şûn têkçûnê,
Bi xemgînî, min fehliya xwe, dikurkusand.
Bi pêş ve, Faust, bi pêş ve...
Çi xewn, mêbûna te, himbêz dikin?!
şîr û tiraf im, hawara rojê.
şeva bêhesab im:
Were dîlbera min!

Sermediya şûneke raketî me.

Gerdûnekî lêvexumehayî,
daweta reşkêşevê ne, em.
De bêjin, çîrokan, bêjin.
Û ez, mêvanê xwelîdankê me.
Nêzîkî min bibe.

Dîtina dawî, di valahiya têkoşrekî de me.
Wê qehpê, paqê xwe ji Enkîdo re, nekirine nasname.
Ezê ba ji xwedayan, dagirim.
Wan bikim şîva dawî.
Yûsiv naxwaze ji wê bîrê, ji hêlîna Meryem, derbikeve!
Li GOYR, DONAU,
ji ber mijûliyên min, rawestiya bû.
Kolanên xerîbiyê bûn, dîlbera min.

Kuç û kevirên ŞARÊKERIKÊ
têra dilê min, nedikirin.
Birako:
Ew mêraniya te li ser vî tuxûbî,
mehrecana xwedîkirinê ye.
De bese şevê, min tevlîhev neke.
De bese şevê,
Nebe sedema bişkivîna ahînan,
di kûrahiya min de.
Godot hat, kurd tenê dîtîna û vegeriya.
Di vê keesrê de, kesk im.

Qîrîna binefşê me, serbizingil im.
Bes e, min tevlîhev neke!
Dinya pûç û betal e.
Bêcîriya mijê, dengê strana evîndara min e.
Di raza şevê de, bêwestan,
li wan çavxezalan, temaşe dikim.
Dilopek ji çiravê,
di navbera xwedayan de
dibe tozgerînok,
Ji destpêka baranê ve,
xewna min mewîjan, dihûne.

Li ser vî dîwarî,
bêrengiya meyê, giha qonaxa nimêjê.
Li ser maza mirinê,
şanogerî şarên xwe, hine kirin.
Seqema herêşimê ye,
pîrozmendiya kaviên şahnaziyê, bi dest dixîne.

De were..
Dorpêçkirina min, ji xelekplanên xwe,
di oqiyanosên matmayî, werbike.

De bese cana min.
Kulên min tevlîhev neke.
Ez...
Çi bibêjim û çi nebêjim?

Ji girnijîna şevên serxweş,
ji henasa berbangên bêzar.
Na, na weleh, ji kerba wan ên,
rojê bêjîng dikin.
Min gelek nêrgiz di dilê xwe de,
bi cî kirine.
Kolan bi kolan, şûna simên min,
nêrbûna min a qaçax
li ser mêza bîranînên min, wêne dikin
Ji rûniştgehên zangoya Helebê, Fakulteya Adab, bipirse.
U ji (.....) bipirse û bi bipirse:
Ka min çend caran, dûmana rondikên xwe,
di nav tabloyên Qilêç û Gulî de,
winda kirine.

Ji bayê,
ko ji ber keziyên zerî û esmeran,
ber bi ba dibû,
bipirse.

Aaah, min çendê caran,
hiş û sewdanê xwe, sipartiyê dengê Miço!?

Bes e, min tevlîhev neke.

Birînên min ên sava, şiyar neke.
Ez çî bibêjim û çî nebêjim;
Tu bi xwedê kî,
Devê birînên min, venekî.
Bêhna kewdanan têt
Ji hêlekê ve, dê
Ji hêlekê ve, bira
Ji kê re bibêjim?
Ji kê veşêrim?

Çîrokvano, dem van çîrokan nasipêre xwe.
Li kûrika xwe, bigere.

Bi reşpekan, tu bîranînên xwe,
liber bê dikî.

Dergeh bigire,
şev ji havîbûna xwe, wê bête der.
xemgmya min a piroz,
dema tu derbas dibî,
sermest û sergerdan dibe.

Daristanek ji evînê -Ez neşiyam bêm-
dî çavê te de, dixwînim.

Were cana min,
bila ew bixûr,
dî ser serê me re, hilbiperike.

Ezê qurbanekê..

ji xezala xwe ya SOMERÎ re, girêdim.
Berî kitika reş bi zarokan re, derbikeve,
Em, bigihin "keştiya Nûh".
Em, bigihin "Keştiya Nûh".

DUGIR, deh mûmên şîngiriyê bo Helebçeya şehîd vêdixîne
û sorgulekê pêşkêşî reşgirêdana Newroza we dike!




**CH
E
M
E
N
Z
O
M
E
N
A
D
R
A
K**

FÛAD GEMO


DUGIR, deh mûmên şîngiriyê bo Helebçeya şehîd vêdixîne
û sorgulekê pêşkêşî reşgirêdana Newroza we dike!



DUGIR, deh mûmên şîngiriyê bo Helebçeya şehîd vêdixîne
û sorgulekê pêşkêşî reşgirêdana Newroza we dike!



DUGIR, deh mûmên şîngiriyê bo Helebçeya şehîd vêdixîne
û sorgulekê pêşkêşî reşgirêdana Newroza we dike!



DURVÊN HUNERÎ YÊN ÇÎROKA MEM Û ZÎN



Rêdûzkirin

Gelek nivîskaran, naveroka çîroka Mem û Zîn a helbestvanê gewre Ehmedê Xanî, dane ber xwe, û xwe pê mijûl kirine; nêrîn û behweriyên wî mirovî kêmezêde diyar kirine. Lê durvê çîrokbêjiya wê, tevî ko balkêş e jî, piraniya nivîskarên, ko Xanî û Mem û Zîn ji nivîsarên xwe re kirine mijar, bala xwe nedane vî durvê hunerî.

Di pirtûka xwe de "Ehmedê Xanî di destana helbestî: Mem û Zînê de", Ya ko bi zimanê erebî çap bûye, Ez di ber vê mijarê re bi lez derbas bûme. Vêca ez dê di vê lêkolînê de, li gel wê mijarê hinekî bi firehî rawestim.

Lê divê ji bîra me neçe ko durvê hunerî û naverok, bi carekê, ji hevûdû bidûr nakevin. Çunkî têkiliya herdiwan li gel hev, wek ya giyan li gel gewde ye. Lewre ev durv û naverok, hîç, ji hevûdû naqetin, ji ber ko gewde bê giyan miriye, jiyan tê de nîne. Arnest Fisher dibêje: "Ger em bala

xwe, tenê, bidin naverokê, û durv jî li pêpelûka diduyan deynin, hingê em karekî bê hiş dikin. Çimkî huner, bi xwe, durvkin e; huner durvê tiştan dide, û tenê durv her afrandinekê dike karekî hunerî. Durv ji bo huner û jiyane tiştêkî gelekî pêwîst e, mercê serkeftin an binkeftina her karekî hunerî, durvê wî karî ye, ji ber ko ev durv, di qelsbûn, an bi hêzbûna wî di karê hunerî de roleke girîng heye."

Avahiya çîrokbêjiyê yekîtiyeke hevgerêdayî heye, ko bi carekê nayê jihevixistin an beşkirin, çunkî hemî beşên wê avahiyê li gel hevûdû, di wênekirin û birêvebirina bûyerê de hevkar in.

Lê tevî van rastiyan, rexnegir û lêkolînavan, ji neçarî, durvê hunerî û naverok ji hev dubeş kirine, da karibin herdiwan bidin ber ronahiya ravekirinê. Lewre jî em, li vir, xwe hêcare dibînin ko vê rêkê bernedin.

Gava mirov Mem û Zîn a Xanî dixwîne, pehlewaniyeke payebilind di teknîka avahiya wê, û şeweyê derbirinê de dibîne. Ev pehlewani jî di paş gelek tiştan de numa dibe, wek zindiyê nerm ko deziyên bûyer tê de dilivin, û hêzeke balkêş ko wêneyên mirovan, yên derûnî û ramanî pê re diherikin, û çelengî û germiya rengan, û rewneqa wêneyan, û rindiya wekhevîkirinê hunerî, ko di navbera zimanekî zîz, û bi hêmanên helbestiyê gelekî dewlemend re numa dibe.

Çarçewa gelemper a çîrokê

Ev çîrok, wek destaneke helbestî, Xanî şeweyê wê ji zargotina kurdî wergirtiye, û xistiye durvekî helbestî gelekî bi hêz û lihevhatî ko li ser rista mesnewî ava bûye.

Çarçewa gelemper a vê çîrokê, ji ya hunera destana rojhelatê bi dûr nakeve. Hemî destanên rojhelatê ji Şehname Firdewsî ve bi pêşgotineke, ko axiftin tê de di gel Xwedê û pêximber dibe, dest pê dike, di dûv re jî helbestvan hemî beşên destanê li gel hevûdû girêdide, da ko derbasî hundirê bûyeran bibe, û paşê dest bi vegotina bûyeran dike, û bi pendekê yan bi şîreteke, ko ji bûyeran, an ji destanê tevî, tê wergirtin, destana xwe kuta dike.

Xanî, di çîroka xwe de, ji vê rêgayê derneketiye. Hemî beşên çîrokê bi vî awayî birine serî. Destan, li gel Xanî, bi navê Xwedê dest pê dîke:

*Ser nameyê namê namê Ellah
Bê namê wî na temame wellah.*

(rûpelpel: 17. malik:1 k:1)

Pêşgotina çîrokê, li gel Xanî, bi şeş beşên ko bi 284 malikan dagirtîne, hatiye raxistin. Xanî tê de pesnê Xwedê û karînên wî, û pesnê pêximber dide, di dûv re jî nêrînên xwe di dinyayê û jîyanê de diyar dîke, û derbasî pergal û rewşa gelê xwe dibe, wek pêşengekî ramiyarî rêgayên çareserkerîna doza wî pêşkêş dîke, û hin bi hin rê dûz dîke, da têkeve hundirê bûyerên çîrokê, lewre wêncya mîr pêşkêş dîke, û di nav re jî berê xwe dide kesên çîrokê yê dîtir, her yekî ji wan di navbera hin malikan re pêşkêş dîke, û pênasîneke kurt dide, di dûv re jî bûyer û beşên destanê diherikin, û bi encamên ko ramana Xanî numa dikin, kuta dibin.

Ev çarçewa gelemper (pêşgotin, rêdûzkerin, bûyerên çîrokê û encam) ne tenê derdora çîrokê bi tevayî digire, lê her beşekî çîrokê jî hembêz dîke. Di pêşgotinê beşan de, pirê caran hin malikên ko Xanî tê de li ser rojhilatî û rojavabûnê dipeyive, tên, an jî karînên Xwedê di afrandina dinyayê de berçav dîke, wek vê pêşgotina beşekî:

*Xellaqê cîhan ji feydê qudret,
Heyatê felek bi wecih futret,
Bê qalib, û bê muhît, û miqyas
Bê alet, û bê muşîr û miqyas.*

(rûpelpel: 51. malik: 470-471)

Hin caran jî, li gel Xanî, wek ko di hemû toreyên rojhelatê de, nemaze jî ya erebî, di pêşgotinê de pesnê şûnmayên dilberê, yan jî pesnê meyê tê, wek vê pêşgotinê:

*Saqî tu ji bo Xwedê kerem ke,
Yek cur`eyê di camê cemke.*

(rûpelpel. 30. malik. 189)

Carcaran jî beşên çîrokê, bi hin destpêkên folklorî dest pê dikin, û di dûv re jî rêdûzkerin tê, lê bi şeweyekî helbestî, hunerî û qeşeng, ko xwendevan ji cîhana helbestî bi dûr naxe. Xanî di vî şeweyî de gelekî jîr û jêhatî ye, bi destên xwendevanê xwe digire, wî dibe nav bûyeran, an jî wî bi

bûyan re dimeşîne; ew bûyerên ko xwendevan bi boneya encama beşê çûye, û pêşgotina beşê tê, jê bi dûr ketibû.

Xanî, ne tenê bûyeran pêşkêş dike, û dide me, lê nêrîn û ramanên xwe jî li wan bûyeran siwar dike, bêyî ko me ji germiya bûyer û lihevhatineke hestî bi dûr xîne.

Dawiya beşan jî pirê caran wek pendekê, an şîretkê tê, ew pend jî an ji metelokên gelêrî hatiye birin, an jî ji hin metelokên gelêrî, ko niho hene, hatine girtin. Ev yek jî girêdayên Xanî li gel afrandinên gelêrî diyar dike.

Hêmanên hunerî:

Hêjayî gotinê ye, em bibêjin ko her çîrokêk, an romanek xwe dispêre hin hêmanên hunerî. serkeftina çîroknivîs jî ne tenê bi heyîna wan, lê bi cihgirtina wan ve jî girêdayî ye.

CÎGEH

Hêmanekî giring e ji hêmanên avahiya çîrokbêjîyê, ko bûyer tê de pêk tê, û mirovên çîrokê tê de dilivin. Çunkî her bûyerek jê re cîgehek dive, û bi nîr û adetên wî cîgehî ve girêdayî ye. Ev yek heyameke zindî dide çîrokê, ji ber ko hundirekî derûnî ji bo çîrokê peyda dike. Ev hêman di çîrokê de, rola tabloyan di şanoyê de dilîze, ji ber ko tiştêkî xuya ye; berçav e, ko alîkariya xeyala xwendevan dike.

Cîgeh, bi wênayên xwe, yên ber bi çav, û bi rewîşt û gerdişe û adetên mirovên ko tê de dijîn, û têkliyên wan mirovan bi hevûdû re roleke sereke di çîrokê de werdigire, da naveroka wê, çi civakî û çi konevanî be numa bike.

Lê tiştê herî giring ew e, ko di çîrokê de divê cîgeh û hêmanên dîtir lihevhatî bin. Çi gava çîroknivîs cîgeh ji bo çîrokê bike destpêk, û di dûv re bûyer û kesan wêne bike, an cîgeh di navbera wênekirina kesên çîrokê re birewşîne, ev yek kengê be, û di çîrokê de li kû be, bê wênekirina heyama tevayî nabe, pênasîna vê heyamê zor girîng e, da xwendevan her tişt û nîrên ko li derdora bûyeran hene, binase.

Bûyerên çîroka Mem û Zînê, li nik Xanî, li Cizîra Botan dest pê dikin, û diçîne dawiyê, vebijartina vî cîgehî ji bo vê çîrokê nîşana serkeftineke hunerî ye, ji ber ko gelek

girêdanên bi rewneq û qeşeng di navbera xwerista Cizîrê û evîna herdu evîndaran de hene. Xwerista Botanê, bi kohên xwe yên bilind û daristanên xwe yên, ko nigên xwe berdidin çemê Diclê, û gulşengên xwe yên rengareng, û payebilindiya Botan ko di dîroka tevgera azadîxwaza gelê kurd, ji bo ji dayikbûna evîna herdu evîndaran "Mem û Zînê" cîgehekî hêja ye.

Cîgeh li nik Xanî bi destpêka bûyerên çîrokê re xuya dibe, lê tiştê hêjayî gotinê ew e, ko Xanî ciwaniya cîgeh di şenahiyê de dibîne, lewre dibêje:

*Sehra û çîmen dikirin mesken,
Beyda û dûmen dikirin gulşen.*

(rûpel . 53. malik. 489)

Sehra û beyda herdu jî peyvên erebî ne, wateya wan çoleke bê dar û bê zevî û bê av e, lê belevbûna mirovan li wê çolê, wê dike gulistaneke xweşik û rengareng. Dîsan Xanî dibêje:

*Rabûneve xanim û xewatîn,
Wan jî tijî gul kirin besatîn.*

(rûpel . 54. malik. 503)

Ev herdu malikên jorîn didine xuyanîkirin, ko cîgeh bê heyîneke mirovane, bê nirx dimîne, heyîna mirovan dişê çolê jî bixemlîne, û çendî gulşen rindik be jî, lê hebûna mirovan tê de, wê hê ciwantir dike. Em dikarin bibêjin gava Xanî vê girêdanê di navbera cîgeh û mirov de peyda dike, û gava cîgeh bi vê rewşê dike hêlîna evîna evîndaran, hingê hejêkirina cîgeh, û pêre jî ya welêt, di dil û derûna mirov de germ dike, û rolahelbestvanên xweristê di warê niştîmanperweriyê de teqez dike.

Cîgeh li nik Xanî, ne tenê ev rola xwe ya ramanî heye, belê roleke wî ya hunerî yî girîng jî heye. Lewre gava mîr diçe nêçîrê, Xanî bi awakî rê dûz dike, da karibe girêdanekê di navbera hestê mirov/xwendevan û heyama nêçîrê de peyda bike:

*Her koh ji rengê torê Mûsa,
Ji enwar tecellayê te Îsa.
Her nehr ji rengê ejdeha bû
Her sebze bi muicûzan e'sa bû
Her dar ji feydê nubuharî,
Yek şu'le dida ji nûr barî.
Her gul ji mîsal atesê tor*

*Yek meşe'el bê qisûr pir nor.
Her murx seher bi xwe kelîmek.
Her totî û qumriyek nedîmek.
Her nexel neda kunende her gah,
Teşbîh Şecer, digo: Enellah.
Xergoş û xezal û gur û aho,
Ew qaz û quling û kebîk û tîho.
Ker ker diçêrîn li koh û deştan,
Ref ref difirîn di nêv bihiştan.*

(rûpelpel: 116. malik: 1426-1433)

Xanî wisa cîgehê nêçîrê raçavî me dike, û tîne bîra me ko armanca mîr û began ji nêçîrê ne tenê kuştin û girtina balinde û koviyên ne, lê armanca seyran û ger e jî. Lewre ev malikên jorîn me dibin deştan û kohiyên, û me li nêv gulşên û daristanan digêrînin. Ev yek dide xuyakirin ko cîgeh li nik Xanî karmendiyeke derûnî ye, ji ber vê jî ev herdû malikên jêrîn, yên ko zîndana Mem li hundirê wê hatiye avêtin, direwşînin, bihna mirov teng dikin:

*Havêtine çalekê bi zarî
Teşbîh bi gor teng û tarî
Mekrûh wekî dehan ejder
Min kir wekî nikîr û munkîr.*

(rûpelpel: 140. malik: 1782-1783)

DEM

Gava Xanî, di cejna Newrozê de, xunceyên evîna Mem û Zînê dibişkivîne, hîngê dilê xwe dide gelê xwe, û vî gelê jar û bindest, tev êş û kovanan, di dilê xwe de dicivîne. Lê rola demê ya hunerî, di çîrokê de, ne tenê ji vê yekê peyda dibe. Dem tevgerekê jî di çîrokan de peyda dike, livekê diyar dike, û çendî bûyer bi hêsanî û zelal di nav demê re biherikin, ewqasî çîrok jî berbi pêpelûkeke hunerî ya payebilind ve hildikişe. piştî 284 malikan, çîroka Mem û Zînê li nik Xanî destpêdike, ew jî destpêkeke hêdî ye, ko dem tê de paşeroj e (Musteqbel e), ango bûyer hê nebûye. Helbestvan bangê li meygêr dike, ko perdaxeke meyê bide wî:

*Saqî bike cam asmanî
Raha weko roh cawdanî.*

(rûpelpel: 39. ma: 285)

Ev destpêkirin li dirêjiya 75 malikan hatiye raxistin, û dem jî tê de tev mand e , rê li pêş salixdana bûyeran dûz dike. Lewre tê xuyakirin ko Xanî ne tenê xwe ji gotin û nivîsandina çîrokê re amade dike, lê dixwaze xwendevan jî têxe pergaleke derûnî, ko jê re alîkar be, da bikaribe guhdar bike, û bûyeran, bi hêsanî, werbigre. Lewre dibêje:

*Dilber li Memê bikin girînê
Aşiq bikenin bi derdê Zînê*

(rûpelpe: 41. malik: 328)

Ango dilê dilberan biqirçîçe, û bo Memo bigrîn, û kesên şeyda ji dilsotiya xwe, ji bo Zînê bikenin.

Ev herdu kiryar "bikin girînê, û bikenin" diyar dikin, ko hê bûyer neqewimiye, ji ber ko herdu jî mandeyî ne. Kiryarên mandeyî tevgerê di çîrokan de sist dikin, an berbi nebûnê ve dikşînin, û asta hunneriya wan nizim dikin. Lê ev ziyan negîhaye çîroka Xanî, ji ber ko Xanî, li vir ne çîrkê dibêje, lê xwendevanê xwe amade dike, da çîrokê bixwîne, û wî têbigihîne. Ango Xanî bi nêrîneke xweser li demê temaşe dike, dem li ba wî rola agehdariyê dilîze, da girêdanekê; têkiliyekê di navbera çîrokê û xwendevan de peyda bike.

Lê gava dest bi çîrokê dike, wê li şeweyê veşerînê siwar dike, û dem li gel wî berbi paş ve dizêvire, lewre jî kirarên buhêrekî, û kesên çîrokê yeka yek, bi vî şeweyê buhêrekî direwşîne:

*Ko padişahêk zemanê sabîq,
Rabû di hikmeta xwe faîq.*

(rûpelpe: 44. malik: 363)

Çîrok li gel Xanî bi salixdana kesan dest pê dike, ev salixdan jî di nav demeke buhêrekî re tê, û pê re jî girêdanekê hunerî bi hêz di navbera pêşgotinê û çîrokê de tê girêdan, ji ber ko çawa dem di pêşgotinê de hêdî û rewan bû, wilo jî di destpêkê de hêdî dom dike.

Xanî, bi vê yekê, ji alîkî ve xwendevan bi hêsanî dixwe nav bûyeran, û ji alîkî dîtir ve jî paşeroja kesên çîrokê numa dike û rê li pêş birêvebirina wan kesan dûz dike.

Ji ber van xalan, dem di çîroka Mem û Zînê de, demeke dîrokî xuya dibe, Ev yek du tiştan eşkere dike, yek ji wan hebûna çîrok û nav û evîna Mem û Zînê berî ji dayikbûna

Xanî ye, û ya dîtir jî ew e, ko Xanî ji dîrok û kelepûrê gelê
xwe peyamê werdigire.

BÛYER

Hêmanekî giring e, ko çîrok bê wî ne çîrok e. Hemî
hêmanên çîrokê, yê dîtir dixebitîn da karmendiya wî
bikin. Ev hêman di bingeha xwe de, pir girêk e, çinkî
her lêkerek di hundirê xwe de pir lêkeran dicivîn e, û
ji wan hemiyan peyda dibe.

Xanî, bûyerên çîroka Mem û Zînê bi awayekî klasîkî ava
dike; ango bûyer, li gel wî, di sê qonqaxan re derbas dibe, ji
wan her sêyan re tê gotin: destpêk, navend, û dawî.

Di destpêkê de, ko jê re (rawestîn) jî tê gotin, em agahdar
dibin ko dem buhar e, xelkên Cizîra Botan xwe amade
dikin, da sibê ji bajêr derkevin, biçin koh û deştan, seyranê
bikin, ji ber ko roj 21ê avdarê, cejna Newrozê ye. Sîtî û
Zînê; herdu xûşkên mîrê Botanê, cilên mêran li xwe dikin,
da bikaribin tev li wan bibin, û her yek ji xwe re xortekî
layiq hîlbijêre. Tajdîn û Memo jî cilên jina li xwe kirin da
tev li jinan bibin, û wan herdu keçikên ko çelengiya wan li
Cizîrê nav û deng daye bibînin. Li vegeerê her çar hevûdû
dibînin, lê bêyî hev nasînekê Sîtî û Zînê nigînen xwe bi yê
wan diguhêrin, û têne malê. Pişt re her çar dipirsin, bizav
dikin da hevûdû nas bikin. Pîrejînek, ko li seraya mîr
berdestiya Sîtî û Zînê dike, dibe alîkar, û wan bi hevûdû
dide nasîn.

Tajdîn ji xwe re Sîtîyê dixwaze, û mîr wê daxwazê
dipejirîne. Mem û Zîn weha, du evîndarên ko ji hevûdû dûr
dimînin, û bi sotin rojên xwe derbas dikin..

Li navendê bûyer birêve diçe, û astengên pirgirêk û dijwar
dikevin pêş Mem û Zînê. Beko; dergevanê mîr wan astenga
bi hêz û dijwar dike, û agirê neqenciye gurtir dike, û bi
sergermî mîr têve dide, da Memo bavêje zindanê. Tajdîn û
herdu birayên wî Arif û Çeko, dostan li dora xwe dicivînin,
û diçin ba mîr, rizgariya Memo dixwazin, ger mîr bi ya wan
neke, wê bi hêza şûran wî jî zindanê bi derxin. Mîr jî, li gor
nêrîna Beko, dest davêje planan, soza berdana Memo dide
wan. Lê soza xwe bi cih nayîne.

Li dawiyê, Beko planên xwe yê qirêj didomîne, şîretê li mîr
dike, ko hemiyan bikuje, jehrê bide: Tajdîn û birayên wî,

destûrê bide Zînê, da biçê ba Memo, hîngê ne Memo, û ne jî Zînê dikarin xwe bigrin, hevdîtina wan dê wan bikuje. Tevî ko mîr dizane ko ev pêşniyara Beko gelekî qirêj e jî, lê beşê wê yê diwem bi cih tîne. Hîngê Zînê xemlandî û gelek jinên Cizîrê li pey wê, ji malê derdikevin, diçin zindana ko Memo tê de ye, lê berî bigihêjin wir, dergevanê zindanê tê, û nûçeya mirina Memo pê re tê, û wek birûskekê li bin guhên Zînê dikeve. Tajdîn dibihîze, û bi hêrs diçe; Beko dikuje, lê gava diçe ko mîr jî bikuje, ew tê girtin û girêdan. piştî rojekê, hemî xelkên Cizîrê, bi girî û şîn li pey termê Memo diçin goristanê, û wî di gorê de vedişêrin. Zîn digihêje gorê û ketineke bê rabûn bi ser de dikeve, vêca gorê vedikin û Zînê jî li kêleka Memo datînin. Ev in hersê qonaqên bûyerê di vê çîrokê de, her yek ji wan bûyer dighîne ya dîtir, û hersê jî wî bi rê ve dibin. Bi hebûna wan her sêyan, bûyer yekîtiyeke hunerî distîne, û ji nûçeyan cida dibe.

WATE

Lê gelo ev bi rêvebirina ko bûyeran di sê qonaxan re derbas dike, û yekîtiyeke hunerî jê re peyda dike, dikare bûyereke lihevhatî bi wêne bike?. Em dibêjin: Na, nikare. Çinkî bûyer bi xwe, wênekirina kesîtiyeke, ko di kar de ye, ew kar jî bê wate nabe. Lê bi carekê çênabe ko ev wate wek perspanekî têkeve ser bûyerê, dive wate ji hundirê bûyerê bê, ne ji derveyî wî, ango ew beşek e ko qet ji bûyerê naqete, ji ber ko her sê hêmanên bûyerê; lêker û kirar û wate yekîtiyeke nebeşkirî peyda dikin. Eger lêker û kira bê wate bin, bê nirx jî dimînin. Ev rastiyên jorîn pirsekê li ber me datînin: Gelo çîroka Mem û Zînê, xwedan wate ye?. Ger hebe, ew wate çi ye? Xanî ev çîrok di demekê de, ko bûyerên germ û balkêş, li Kurdistanê dibûn afirandiye. Di hundirê Kurdistanê de gelek birînên kûr hebûn, maka hemiyên jî perçebûna mîrîtiyên kurd bû, ko bûbû sedemeke sereke ji sedemên du beşkirina Kurdistanê ya di nebera Osmanîyan û Sefewîyan de, wisa serax û binaxa welêt ketibû destên wan, mîrên kurd jî her yek li serê xwe siwar bûbû, û guhên xwe nedidan deng û bangên welathezan û gelê xwe perîşan û di bin destê

dijmin de hiştin. Di wan nîrên teng û dijwar de, Xanî di sala 1695an de ev çîrokê nivîsandibû.

Eger em li çîrokê vegerin, em dê bibînin ko Xanî, di navbera herdu kesan de ji kesên çîrokê, girêdanekê peyda dike: Sitî û Zînê, Tajdîn û Memo, Mîr û Beko. Lê gava Tajdîn û Sitîyê digihêjin hevûdû, li hemberî girêdana ko di navbera Sitî û Zînê de, û ya ko di navbera Tajdîn û Memo de heye, sist dibe, lê ya di navbera Mîr û Beko de heye bi hêz dibe, dom dike, ta ew herdu bi serdikevin. (kuştina Beko ziyane nagihîne vê encamê).

Livandîna kesên çîrokê bi vî awayî, ne ji ber xwe ve wilo bûye, wateyeke vê livandinê heye, ew jî wek em dibînin ew e ko Xanî dixwast bigota: Bê yekîtî û hevgerîtin, serkeftin nîne.

Ji hêleke dîtir ve, me dîtibû ko mîr bi carekê guhê xwe nedabû gazine û nalinên xûşka xwe Zînê. Lê her û her guhên wî li pêş pendên dergevanê wî vekiribûn. Xanî, xwestibû şeweyê karbidestîya wê demê, di navbera van têkiliyan re bide xuyakirin, û neyîna sergêrên gelê kurd di hiş û xewnên mîran de diyar bike.

Ev wate ji hundirê çîroka Mem û Zînê tê wergirtin, û dide xuyakirin, ko lêker û kirar; ango bûyer û kesên çîrokê jê re karmend bûn. Ango hunerîya vê çîrokê bi vê gavê digihêje asteke bilind.

Eger em bêne hêla kesên çîrokê, em dê bibînin ko ew kes yekser derbasî nava bûyer nabin. Helbestvan bi pênasîneke kurt, rê li pêş derbasbûna wan dîz dike, ew rêdûzkin jî bi navê wî kesî dest pê dike, û di pişt re, Xanî rewşên wî diyar dike, û wêneya wî dikole. Bi vî awayî ew kes derbasî nava bûyeran dibe, da, bêyî hêrs, û bêyî ko alîkariyekê ji hêla helbestvan bigire, xwe bi xwe, xwe numa bike.

Herdu keç; Sitî û Zînê, wek hev in, hevxişk in, ji malbata mîr in, çeleng in. Lê kîjan wê ber bi navenda bûyeran ve biçe, bibe lehenga çîrokê?. Helbestvan bersivê nade. Rê dide herduyan. Lê yek ji wan tê pêş, û li gel bûyer hin bi hin mezin dibe, û tîrêjan ber bi xwe ve dikişîne.

Me ew herdu, bi cilên mêran dîtibûn, ji mehrecana cejna Newrozê vedigeriyan, û şanên evîne li wan beloq bibûn. Hêlana pîr tê ba wan, gustîlkan di tiliyên wan de dibîne, gustîlkan dixwaze, da xwediyên wan nas bike. Li vir rê ber bi sayîbûnê ve diçe, û nîşanên hundirên kesan ber bi roniyê ve diçin.

*Hazir Sitiyê nigîn deranî,
Da dest 'ecûzeya zemanî.
Zînê weha gote heyzebonê:
Min dil bûye werteyek ji xwînê.
Gava weko werte tête coşê,
Weqtê ko dikît bikît xweroşê.
Teskîn dikît ew nigîn dilê jar,
Dem dem ko didin di çesmê xwînbar.
Zinhar eger dibî nigînê,
Zû bîneve bo me dil hezînê.
Lew re bûye bo me sebr û saman,
Ew bo mine xatema Silêman.*

(rûpelpel: 69. malik: 720-725)

Ev malikên jorîn didine xuyakirin ko Zîn xwe têvedide navenda bûyeran. Li hêla din, herdu evîndarên şeyda; Memo û Tajdîn jî evan gavên bê tebat dijîn, û ew pîrejin tê ba wan, nigînan (gustîlkan) ji wan jî dixwaze. Ma gelo kîjan wê xwe têvede navenda bûyeran?. Ne helbestvan, lê

*Ev malikên jêrîn bersivê didin:
Tajdîn nigîn ji dest deranî,
Da dest 'e cûzeya zemanî.
Mem tê fikirî ko bê nigînê,
Kengê diketin medar û jînê.
Go: Dayê tu min bidêre me'zûr
Kî can didet ji dest xwe destûr.
Ev xateme ism e ger tilsim e,
Min can ew e, qalibê me cism e.
Sedeqê ser û zilf û xalê zînê,
Mestîne ji dest me nigînê.*

(rûpelpel: 75. malik: 813-818)

Belkî ev xal, ji bo girêdanekê di birêvebirina hundirê kesayetiya Memo, û girêdana wî li gel bandorên derveyî û bûyeran tevan, bûbe destpêkek, da ev kesayetî hin bi hin mezin bibe, û di navbera bandor û per lêxistinên hunermendekî gewre de, ber bi hev bê, ev hunermendê ko hunera xwe û hemî tiştên der û hundirê cîhana lehengê xwe, bi dest xwe xistine, û tiliya xwe bi hêz, daye ser alavên xwe yên hunerî, da ew kesayetî ji navbera komên bandoran bi hêz derbas bibe navenda lehengiyê.

Bi vî awayî kesayetiya Memo, li gel bûyerê, bi rê ve diçe, ango kesayetiyeke venîştî ye, bi liv e, hin bi hin mezin dibe û bi pêş ve diçe.

Gava helbestvanê me kesayetiya Beko nîgar dike, ev wênekirin li himber a Mem û Zînê, tê guhertin, û digihêje asta karekî gihiştî, ji bo wênekirina kesayetiyeke berz û balkêş, û xwedî wêneyê xwe yê dîrokî, wek nûnerekî hêzên neqenciye.

Çi reng û sixêf û rewş hene, helbestvanê me ewan gişkan bi kartîne, da wêneyeke qirêj û ne qenc ji vê kesatiyê re peyda bike, û pişt re jî rê bide wê, da ew, di çîrokê de, wek roviyekî, dek û planan bike, û tevger û bizavên xwe bidomîne.

Li hezar plan û rêkên nedurist siwar dibe, ber bi armanç û daxwaza xwe ve diçe, dide û distîne, gotgotan dike, armanca xwe nîşan dike, da di dema keysdar de lê de, û daxwazê bi cih bîne.

Kesatiya mîr û ya Beko, di çîrokê de hev û du temam dikin. Xanî dide xuyakirin ko yek bê yê din nabe. Guh bide mîr çi dibêje:

*Em qismê mîr, qismê aşin,
Pirr fetl û gerîn, pêş û paşin.
Naçar ji bo me aşvanek,
Labude ji bo me dergevanek.
Hingî bi hikmetê dikin dewr,
Geh 'edle ji bo mekar, geh cewr.
Her çend Bekir weted zîna ye,
Aşê me ji wî bi fetl û ba ye.
Ev zumre ko zalim û 'ewanin,
Subaşi û şehne dergevan in.
Aşêd me zaliman digerin,
Dexlêd me zalima dihêrin*

(rûpel ... : 96-97. malik. 1140-1145)

Bi vî awayî, Xanî, kesayetiya mîr ber bi çav dike, û hevalbendiya wî û dergevanê wî, li gel hevûdû girê dide. Eger Xanî, ji vê yekê nêrîneke taybetî, ko bedkariya karbidestên dema xwe diyar dike, heye, bê guman ew bi vê yekê, me bi pêşeroja vê hevalbendiya qirêj jî hayedar dike, ko ewê astengan deyne pêş evîna Memo û Zînê.

TEVNA ÇÎROKÊ

Eger em bêne ser tevna hunerî, em dê bibînin ev tevn, li gel Xanî, bi alavên derbirîneke hunerî dewlemend û zindî ye jî. Alavên wî hin caran vebêjî ye (serd), û hin caran jî pesn û salixdan e û carcaran jî axiftineke xweyî û

hundirînî e, û hevpeyvîn e jî. Ev alav tev li milên zimanekî zîz, ko karînên zimanzanîna Xanî ber bi çav dikin, siwar dibin.

ÇÎROKBÊJÎ

Çîrolbêjî hêmanekî giring e, di çîrokê de xwedî roleke payebilind e, çimkî bûyer ji wêneyên hebûyî (waqîf) diguhêze wêneyekî zimanî-hunerî, karê çîrokbêjiyê jî ew e ko bikaribe rewşên axaftina hunerî, di dest xwe de, bike alîkar, da hişê xwendevan têxe pergaleke nîşankirî de, ji bo bikaribe naverokeke çeleng, wek ko çawa nivîskar dixwaze, bighîn e.

Ji bo pêkanîna vê daxwazê, dive nivîskar, di avakirina durvê derbirîna vê naveroka çeleng de, ya ko di hişê xwe de ava kiriye, dive bi karekî gelekî mezin rabe. Lewre em dibêjin vebêjî û çîrokbêjiya di çîrokê de rolek e girîng dilîze.

Ji bilî vê jî gelek cureyên xeberdanê (vebêjiyê) hene, wek xeberdana xwebixweyî, ko nivîskar tê de bernavê "ez" bikar tîne, an jî xeberdanê dide dest çîrokbêjekî. Ev cure hêsantirîn şêweyên xeberdana bûyerên çîrokê ye, lê kêmasiyên wê jî hene, çimkî hin caran xwendevan, û belkî rexnegir jî, vî cureyî wek jînenîgariya nivîskarî dibînin.

Cureyekî dîtir heye, jê re tê gotin (şêweyê bîranînan). Nivîskar li vir jî cînavê "ez" bi kar tîne, û bi zimanê lehengê çîrokê diaxive, û ji her bîranînekê re dîrokekê datîne. Di vî cureyî de, nivîskar lêkerên buhêrekî, ko di nav wan re bûyerên çîrokê numa dibin bi kar tîne.

Cureyên sêyem, ko jê re (şêweyê nameyan) tê gotin, nivîskar tê de ji nameyên ko di navbera lehengên çîrokê de diçin û tîndê werdigire, û kesên çîrokê û sergêrên wan kesan numa dike, û heyama gelemper a çîrokê ber çav dike.

Lê cureyê herî binav û deng, ko Xanî jî di çîroka xwe de bi kar tîne, xeberdana yekser e, ko (şêweyê destanî) jê re tê gotin.

Di vî cureyî de, nivîskar, bernavê nediyar bi kar tîne, kar û barê wî, di vî cureyî de karê dîrokzanan e, bûyeran li pey hevûdû vedibêje, kesan pêşkêş dike, bizavên wan şirove dike. Nivîskar li gel wan bûyeran, û wan kesan meşeke xweşik dimeşe, ta ko bûyer digihêjin dawiyê.

Hêjayî gotinê ye: Di vî cûreyî de, nivîskar hêza xwe nade ser kesên çîrokê, zanîna wî ya li ser wan, ji wan bi xwe ne pirtir e. Lewre ji dûr ve çîrokê vedibêje, bûyer û kesan ji derve salix dike, tenê tiştên numa wek azadî, têkilî û encamên wan, dibêje. Lê wateyên ko di paş wan tiştan de hene, ji xwendevan re dihêle, da ko xwe bi xwe tê bigihêjin. Xanî ji destpêka çîroka xwe ve vî cûreyê çîrokbêjiyê bi kar tîne. Eger mirov lê vegere, dê bibîne bê çawa kesên çîrokê pêşkêş dike:

*Ko padişahêk zemanê sabîq
Rabû di hikometu xwe de faîq
Textê wî cizîr û bext mes`ûd
Tali`qewî meqam mehmûd
Asar şeca`eta wî şahî,
Dagirtî ji mah ta bi mahî.*

(rûpelpel 44. malik: 363,365,371)

Û gava kesên Cizîrê xwe ji bo cejna sersalê amade dikin, Xanî dibêje:

*Hikmet ew e ew hemî li kar in
Hindek di peya û hin siwar in
Bîlcumle diçûne der ji malan
Heta digihêste pîr û kalan.*

(rûpelpel: 52. malik: 474,487)

Çîrokbêjiyê firehtirîn cîgeh di çîroka Mem û Zînê de dagirtiye lê mixabîn huneriya wê hin caran ji dest helbestvanî derdikeve û hêza wî ya xeberdanê giran dibe, wek ko em di van malikên jêrîn de dibînin, Xanî rê nade me, da em bi xwe mîrê Botanê nas bikin, û ne jî dihêle ew xwe bi me bide nasîn, dîsan nahêle em bi xwe bibînin bê çawan xelkên Cizîrê ji malan der tînin, lê ew bi xwe şanî me dike. Ev yek huneriya xeberdanê qels dike. Ma gelo Xanî nedizanî karê xeberdanê çi ye? Em bawer nakin. Çinkî hin caran xeberdan hêsan û zelal dixuye, û nerme-nerm diherike, hêza helbestvanê me li ser xuyanî nake, ango hin caran xeberdan, li nik Xanî digihêje astayên hunerî yên bilind, wek çawa di van malikên jêrîn de tê xuyanî kirin:

*Tajdîn ji tewabi`ên xwe yek pîr,
Tê`în kir, û şihande cem mîr.
Gotê: here bêje mîr û axan,
Bêninde venakujîn çiraxan*

*Em çar bira hebûn di sadiq
Herçar li xidmeta wî di aşiq
Însafê ko zêdetir ji salê
Mem mayîye vê xwedan, çalê?
Dijmin li me şa ne, dost xemgîn
Ferde mirina çeko û Tqajdîn*

(rûpelpel: 14 ma: 1916-1921)

Lê tiştê hêjayî pesnê ew e, ko pirhatina xeberdanê tu ziyan negihandiye avakirina çîrokê, ango di çîrokê de xeberdan ji derveyî bûyeran nehatibû, û her car xweşiktir û tevli salixdanê dibû, û ciwanî jê werdigirt.

SALIXDAN

Salixdanê çîrok tev girtiye, û perê Xanî tê de wek ê hostayekî zîrek xuyanî dibe, li hember salixdana ko Xanî dide gulistana mîr, û ya ko dide herdu xûşkan "Sitî û Zînê" û dilêrî û dilsoziya Tajdîn, mirov behitî dimîne. Û gava li hember xwerista Cizîra Botan disekine û bêhna xwe jê dadigre, vê dîmena çeleng wek tabloyekê diyarî me dike:

*Her yek ji newal û koh û deştan
Reh şubheyê goşeyê bihiştan
Her rewde riyad xuld ekber
Her çeşme ji e'yn ab kewser
Herr koh ji reng torê Mûsa
Ji enwar tecelayê teyîsa
Her nehre ji rengê ejdeh bûn
Her sibze bi mui'cuzan e'sabûn
Her dar ji feydê nubuharî
Tek şui'le dida ji nor barî*

(rûpelpel: 116. malik: 1424-1428)

Tiştê balkêş ew e, ko salixdana Xanî ne xav e, û nejî rij e, ji ber ko li gelek wênayên hunerî siwar dibe. Ev yek jî heyameke tijî tevger û reng di çîrokê û di şêweyê helbestvan de peyda dike, û pê re jî çîrokê dike tabloyeke hunerî, ko helbestvanê hunermend di afrandin û çêkirina wê de karekî mezin û xebateke gewre kiriye. Keçên bedew li deştan û çolan belav dibin, û wan beriyan dikin gulşen:

*Sehra û çîmen dikirin mesken
Beyda û dîmen dikirin gulşen*

(rûpel 53. malik 489)

Û gava dixwaze bandora, ko evîna herdu keçikan; Sitî û
Zînê li Tajdîn û Memo kiriye, numa bike, pîrsê dide dest
herdu evîndaran, û bi zimanê wan dibêje:

*Ew mêwe li kî cihê gihane
Ev gul li çî gulşenê numane*

(rûpel 59. malik: 574)

Diyar e ko mêwe nîşana bandora evînê ye, û gul jî herdu
keçikên çeleng in, lê gava germbûna evînê ber bi çav dike,
evîndaran dixê nava êgir, cegerên wan disotîne:

*Ew bûne li van ceger kevandin
Ew bûne ko van bi dil hebandin*

(rûpel 62. malik: 624)

Pirîcaran wêneyên hunerî li ber perê Xanî dibine tabloyeke
hunerî, bê kêmasî, ko zîrekî û jêhatiya wî di afrandina wan
zindî û gerînî de ber çav dike, wek vî wêneyê, ko ji şingîniya
tîr û şûran, heyamek tijî deng û qîrîn tê de peyda dibe:

*Dirrinde dirandibûn bi şîran
Perinde pirandibûn bi tîran*

(rûpel 117. malik: 1449)

Hincaran jî em dibînin wêneyên gulan dicivîne, li kêlekên
hevûdû datîne û di pê re jî hin wêneyên nû, ko li
wekhevkinên hunerî yên nû siwarbûne, jê peyda dike.

Çelengiya gulan ya di gulşenan de, û ya ko di helbestan de
hatiye çêkirin, di van wêneyên nû de kom dike, lê di
navbera hemberhevdanê hestî wijdanîke, ko ji reh û
hinavên evîndarekî şeyda dertê, û bergehên ko di navbera
herdu kêlekên wekhevkirina hunerî de, hene, tune dike, û
dilberê ji gulan şepaltir û şengtir dibîne:

*Gul yek ne tenê, ko sedhezâr in.
Gulşen didîtin di nû buhar in.
Me'şoqê ko mistê wan gelek bin
Her çend ko horî û melek bin
Ew nabin mûcibê çî derdan
Lew ra ko heyin li cumle erdan
Yek bêt, û nebit mîsal hemta
Mestûr ji rengê Zîn 'enqa
'Aşîq bi çî dê bikit medar.
Bê sebr û mirin emê çî çare.*

(rûpel :123-124.malik: 1538-1542)

Hin caran jî wêneyên hunerî yên Xanî pir girêkî û li hev geryayî tên, sûdê ji wêneyên nasbûyî werdigre. Rojava, bi hemî hêman û alavên xwe, wek roj, aso, û stêran li nik Xanî tê guhartin, û ev wêne jê peyda dibe:

*Êvarî ko asmanî menqel
Danî, û li wan veşar meş'el
Yê'nî ko vekuşt çirax zêrîn
wergirt ji nû libas rengîn.*

(rûpel 152. malik: 1964-1965)

Wêneyên huner, li nik Xanî, ji hêmanên suruştê tije dibin:

*Ew çend ji a'ridêd gulgûn
Vêkra diwarîn serşik pir xwîn
Goya ko di festê nubuharî
Baran li gulşenan dibarî*

(rûpel 173-174. malik: 2283-2284)

Tiştê ko di wêneyên Xanî de balkêş e, rojhilatiya wan e, bêhna hêsaniya jiyana kurdan, û derbirîna gelêrî, ya ko ketiye çarçeweke nû, jê tê:

*Go ey hewesa dil û hinava
Her yek ji we rohniya du çava.*

(rûpel 64. malik 656)

Ev gotin "rohniya du çavan" her rojê pirçaran di derbirîna gelêrî û filoklorî, û ji devên pîrejinên kurd der tê. Ev yek bergehane di navbera Xanî û kelepûra kurdî de tune dike.

HEVPEYVÎN

Di navbera van hemî tiştên ko derbasbûne de, gava derî ji hevpeyvînê re vedibe, ew jî di cihên ko bêyî wê nabin de, tê, û bingeha hunerî diparêze, da derbirîn zelal û zindîtir bibe, û bikaribe hundirê derûna kesên çîrokê numa bike.

Hevpeyvîn, bi xwe, axiftinek e, ko di navbera du, an pir kesan de dibe. Çîrok û şano di vî warî de hevbeş in, lê di çîrokê de, hin caran tê, û di şanoyê de stûneke giring e ji bo xwesipartina nivîskarî, ji ber ko şano ji bingeha xwe de, li ser hevpeyvîna ko di navbera kesên wê de peyda dibe, ava dibe.

Hevpeyvîn, di çîrokê de, li kêlek xeberdanê, roleke hunerî, û armanceke rewşenbîrî dileyizin, ji ber ko heyameke germ

di çîrokê de peyda dike, û şêweyê drbirînê zindîtir dike, û zanîn û rewşenbîriya nivîskaran êşkere dike.

Kar û barê hevpeyvînê di çîrokê de ew e, ko perdeyan ji pêş bûyer û hêrsên kesên çîrokê hilîne, û wan biwênîne, û çîrokê bi rê ve bibe, da hêmanê dramafîka wê xurtir bibe, û hundirê derûna wan kesan ronî bibe.

Bi rastî jî hevpeyvîn li nik Xanî, roleke hêja di çîrokê de lîstiyê. Eger em li malikên jêrîn mêze bikin, em dê bihêsanî bibînîn ko ji hevpeyvînê pê ve, wê tu tiştê dîtir nîkaribe wêneyên derûnî yên herdu lehengan, nemaze di hevdîtina dawî de numa bike:

Perwanyê go: Tu xweş delîl î

Şeme'yê wehe go: Tu xweş xelîl î.

Perwaneyê go: Tu rehnema yî

Şeme'yê wehe go: Tu can fîza yî.

Perwanyê go: Tu dil fîzor î

Şeme'yê wehe go: Tu sîne soz î.

Perwaneyê go: Tu padîşah î

Şeme'yê wehe go: Tu quble gah î.

Perwanyê go: Tu hor zat î

Şeme'yê wehe go: Tu nor zat î

(rûpel, 11: 168. malik. 2192-2197)

Eger ne hevpeyvîn bûna, wê salixdan, an xeberdanê, bi tenha xwe nîkarîbûya ev wêneyên derûnî û ramanî yên mîr û dergevanê wî biafranda. Hevpeyvînê roleke bîngêhîn û girîng di vê pergale de lîstibû, û rasteqîniya wêneyên herdiwan ber bi çav kiribû. Em li mîr guhdar bikin bê çi jî Tajdînî re dibêje:

Ev renga mîr digote Tajdîn:

Fî'lêd Bekir negir nîzanîn

Em qismê mîr qismê aş in,

Pir fetl û gerîn, pêş û paş in

Naçar ji bo me aşivanek,

Labudde ji bo me ayvanek.

Hingî bi hikometê dîkin dewr

Geh e'dle jibo me kar , geh cewr.

Her çend Bekir weled zîna ye,

Aşê me ji wî bi fetl û ba ye.

Ev zumre ko zalim û e'wan in,

Sûbaşî û şehne û dergevan in.

Aşêd me zaliman digêrî

Dexlêd me zalima dihêrin.

*Ev a' det tenê xas mîran
Nabînî li ber derê feqîran*

(rûpel. 96-97. malik. 1139-1145, 1148)

Û carekê Bekir dibêje mîr:

*Zahir meke tu evê î'nadê
Carek vekuj agrê fesadê
Ji ew paş tu bêxe weqt firset
Zinhar medê eman û mihlet
Xesmê ko neşê bibî muqbil
Derman çi ye? şerbeta helahil
Lew lazim e ji hakimî du fincan
Yek xas xerab e yêk qencan*

(rûpel. 150. malik: 1936-1939)

Eger em li nik evan malikên jorîn rawestin, hêdî hêdî li wan mêze bikin, em dê du wênayên zelal, ko mîr û dergevanê wî tê de bi awakî sayî numa ne, bibînin. Ew herdu wêne tije dek û plan in. Bê guman, hevpeyvîn arîkariya me dike, û me dighîne wan wênayan. Ji min ve diyar e ko Xanî ev yek baş zanîbû, lewre her yek ji wan, li cihê ko xwe tê de rehet dibîne, û li ba mirovê ko pê bawer dike, bi dengkirin dabû.

Ev tiştên ko me diyar kirine, dişên teqez bikin ko hevpeyvînê li nik Xanî, karibûye derûna kesên çîrokê wergerîne, ronahî avêtibû ser wan pêlan, û hundirê derûna wan kesan li pêş me vekiribû, heyameke zindî tijî ger û liv di çîrokê de pêkanîbû. Vê yekê jêhatiya perê Xanî di avakirina wan kesan de numa kiriye, ew jî avakirineke zindî bû, nîşanên penahên derûn û hundirê wan kesan tê de tene xuyakirin, û ramanên ko di hişên wan de li hevdu dikevin, sayî tene wergirtin, û me dide hember hevdişîtiyeke gelekî sayî, nêrîneke heyînî, ko ji newekheviya daxwazên xizanan û yên mîrên fewdal peyda dibe, bingeha wê ye.

Xanî li pey kûrkirina wênayên hunerî, yên kesên çîrokê, û şirovekirina wan wênayan, hê bilez û bez diçe, destan jê bernade. Pirîcaran axiftina monologê bi kar tîne, rê dide kesên çîrokê, da bi xwe, tişt û ramanên hundirê xwe derînin. Lewra hin caran em dibînin Zînê di nava çar dîwaran de ye, derî û pencere girtî ne, bi xwe re dipeyive.

Xanî, rewş û pergala wê, nesaxî û jarbûna wê, ji der ve de wêne dike, û pişt re xwe li hember wênakirina hundirê wê bê çare dibîne, ko nikare têkeve wî hundirî, hingê divabû rê bide xwedî, da çi tê de heye, ew bi xwe derbibire. Ji ber vê yekê Xanî xwe dide alîkî, û Zîn li gel nediyaran diaxive:

*A'şiq bi we wasîtê cemalî
Salik bi we nailê celalî.
Wêrane ye dil we maye xalî
Qet xeyra we kes nahin hewalî.*

(rûpel 104, malik:1256-1257).

Hin carên dîtir, em wê dibînin ko çawa berê xwe dide sîbera
xuşka xwe Sîtiyê, û pê re diaxife:

*Kay rûh û rewan qelbê Zînê
Nûra besera diyar û dînê.
Şahî ji te re, û xem ji bo min
Tajdîn ji te re û Mem ji bo min.*

(rûpel 105, malik: 1265,12673)

Ev xwe bi xwe axiftin, bi dilsotin li gel Zînê didomîne,
cidayiya ko di navbera rewşên herdu xuşkan de peyda bûye
numa dike, lê Zîn ne tenê li gel sîbera sitîyê diaxive, pirê
caran ew li hember perwaneyên ko li derdora agirê findan
digerin radiweste, û bi wan re diaxive, û keser û hesretên
dil û sînga xwe der dike.

Em vê monologê li cem Memo jî dibînin, Xanî rê dide wî, da
derkeve, bi tenha biçe, li koh û newalan bigere. Bi xwe re
biaxive, an bi sîtava dilrevîna xwe re , an jî li kêleka çemê
Diclê raweste, û keserên xwe jê re bilorîne:

*Kay şubhetê eşkê min rewan e
Bê sebr û bê sikûnê a'şiqan e.
Bê sebr û qirar, û bê sikûn î
Yan şubhetî min, tu jî cinûn î.
Qet nîne ji bo te re qirarek
Xalib di dilê te dane narek.*

(rûpel 109, malik: 13201323)

Pirê caran Memo li nik bê jî radiweste, û bi sotin û dilêş pê
re diaxive, û lava jê dike da rêka xwe bi dilbera xewrevîn
xîne, û bi dilekî şikestî eniya xwe ji wê re berjêr bike,
silavên germ bighîne wê:

*Kay cismê letîf şubhetê rûh
Dergehê beden li ber te meftûh.
Ez hêvî dikim ko bê tewequf
Rincîde qedem bibî tekelif
Carek here suddetil-se'ed
Gavek here sudretîl-nîhayet.
Ewel here bibûse astanê*

*Paşê here pêş dilistanê.
Emma bi tewadi' û te'zîm
Sed mertebe ihtîram û tekrîm.
Ahiste ji bo bike du'ayê
Dabeste wê bike senayê.
Şayiste bike tu ihtîram
Dest beste vewest bike selam.*

(rûpel...: 110. malik: 1337-1343)

Tevî ko helbestvanê me, di vir de, dide pey şopên hin helbestvanên rojhilatê yên dîtir, nemaze yên ereb, û Feqê Teyran (1564-1660), lê karîbû wêneyeke zelal û sayî çêbike, ko pêlên derûnî û hêrsên herdu lehengan tê de eşkere xuya bibin.

Ev nimûneyên ko me nîşan kiribûn, didine xuyakirin, ko Xanî bi zanîn û bi jîrbûneke payebilind monolog bikar tanîn.

Çimkî karê monologê ew e ko, me têxe hundirê kesên çîrokê da tiştên tê de hene, dûrî pêşkêşkirina bûyer, yan hevpeyvîna bilêv, berçav bike, ji ber ko monolog, wek ko zanyarên derûnî dibînin, ji bo ronîkirina asteyên hişyariyê alîkarekî hêja ye; berî ko bi derbirinê bêne wergerandin.

Ev cûre teknîka hunerî, bi cûreyê nivîskarê Firansayê Edward De Jordan (1861-1949) tê naskirin. Çawa tê gotin ewî mirovî ev teknîk di çîroka (Darên Daristana Qutbûyî) de, ya ko di sala 1888an de li Parîsê der çûye, pêk anîbû û dabû nasîn, ko monolog axiftina kesekî naskirî ye, armanc jê ew e ko bêyî alîkariya nivîsevan, me têxe hundirê wî kesî de. Monolog axiftineke bê guhdar e, guhdar jê re nîne, ji ber ko axiftineke bê lêv e.

Tiştê balkêş ew e, ko berî monolog weke alaveke hunerî binav û deng bibe, berî vê yekê bi dused salan, Xanî karê vê alavê nas kiribû û sala 1695an, di çîroka Mem û Zînê de, bi kar anîbû, lê em neşên bibêjin ko Xanî xwediyê wê ye, ji ber ko Feqê Teyran berî wî bi kar anî bû, belê em dişên bibêjin ev xelek nîrxê wî ye hunerî digihîne asteke bilind.



ZIMAN

Di tevna hunerî de, ziman roleke payegiran dilîze, ji ber ko ev curetevn bi zimên tê ristina û xwendin, û çîrokê pê heyîna xwe bi cih tîne. Ji vê pê ve ew rola nirxibilind, zindiya zimên bîngeha wê ye. Lê wê çawa ziman zindî xuya bibe?. Şeweyê tijî tevger û liv, û nêzî jiyana rojane, û ji peyvên hêsan pêkhatî, zindiya zimên berçav dike.

Hêjayî gotinê ye em bibêjin ko çendîn bergeh di navbera heyama çîrokê ya gelemper, û şeweyê derbirinê de hebin, ewqasî zimanê wê qels, jar û bê giyan xuya dibe. Lewre bidestxistina zimên ji hêla nivîskar ve zor giran e.

Zimanê Xanî di vê çîrokê de zindî, tijî hêmanên helbestiyê xuya dibe, çunkî di navbera heyama gelemper a çîrokê û zimanê wê de, bergeh nîne. Du tiştên sereke vê yekê teqez dikin:

1- Tevlihevkirina çar zimanên, ko Xanî baş desthilatê wan bû, ew jî, zimanên kurdî, 'erebî, tirkî û farisî ne, ko di wê demê de, li rojhilatê bi kar dihatin.

Bikaranîna peyvên biyanî, li nik helbestvanên rojhiletê, yên dema Xanî, ne kêmasiyeye zimanzanî bû, û ne jî şermeke hunerî bû. Tevî vê jî, tiştê balkêş ew e, ko Xanî ewan peyvên biyanî dixê ristina siwarkirina hevoka kurdî:

*Rabûne ve rojekê pêkve
Fikrîne bi reng û rûyê pêkve.*

(rûpel: 60. malik: 597)

Di vê malikê de Xanî peyva 'erebî (fikir) bi kar tîne. Ev peyv di wî zimanî de nav e, lê Xanî paşkîta lêkerê kurdî pê dixê, û lêkerê jê peyda dike, wateya wî, di malikê de, dibe (nêrîn), çimkî wateya malikê weha tê: Rojekê herdu (Tajdîn û Mem) pêk ve rabûn ser xwe, berê xwe dane hevûdû.

Xanî ne tenê vê peyva 'erebî bikar tîne, lê belê pala xwe dide hin zimanên dîtir jî, û biserbilindî jî vê yekê eşkere dike:

*Kurdî, 'erebî, durrî û tazî,
Terkîb kirin bi hezî û bazî.*

(rûpel: 186. malik: 2476)

Bidexistina van zimanan, şeweyê Xanî dewlemend dike, û jê re dibin alîkar da dergehên afrandinê li pêş wî firehtir vebin, wî ji xelekên sînorkirî rizgar dikin, da çi şîyanên van zimanan hebin, gişan ji bo armanca xwe bike karmend, û festîvala jidayikbûna destana kurdî, ji hundirê derûna kurdî ya dilovan der bixe.

2- Xanî hemî zaravayên zimanê kurdî, û beşên wan zimanan bi kar tîne. Bingeha zimanê çîroka Mem û Zînê, devoka botan e, ji kurdmanciya jor e, lê pirîcaran Xanî destên xwe dirêjî zaravayên kurdî yên dîtir dike, û peyvên wan bi kar tîne, wek vê peyva (nedêrîn) ko fileyên Lorî wê bi kar tînin:

*Ey waqîfê waqî'etê dêrîn,
Em xeyrete mehreman nedêrîn.*

(rûpel: 77. malik: 852).

Xanî ne tenê peyvan ji wan zaravayan werdigire, lê gava hevoka xwe siwar dike jî, bi ser ristina hevoka wan de pal dide:

*Êdî çi bibêjim , ez nizanîm,
Bilmez ge ne sûyleye zubanîm.*

(rûpel: 126. malik: 1577).

Di vê malikê de du zaravayên kurmacî hene, û hevokek bi tirkî û kurmacî, tevlihev, heye. "Êdî çi bibêjim, ez nizanîm" bi kurmanciya jor, (Zubanîm) bi kurmanciya jêr, û (bilmiz ge ne sûyleye) bi tirkî, ango: (zubanê min jî nizane çi bibêje). Lê tiştê ko bala me dikşîne ne tenê ev yek e, lê siwarkirina hevokê ye jî.

Di zaravê Xanî de, (Devoka botanî ji kurmanciya jor) cînav bi navan nakeve, lê di zaravê kurmanciya jêr de, dikare weha çê bibe. Ango kurmanciya jor dibêje (zubanê min), û ya jêr dibêje (zubanîm).

Gelek caran Xanî hevoka xwe bi kurmanciya jêr dirêse, wek çawa di malika 765an de dibêje (şêxim), û di ya 1610, 1974an de dibêje (mîrim), nabêje (mîrê min).

Nimûneyên ji vî cûreyî, li gel Xanî gelek in. Çimkî wek tê zanîn, di devoka botanî de, ji kurmanciya jor, pergala pirjimarî ya navan, bi paşkîta (an) tê nas kirin, wek nimûne (bajar-bajaran), lê gava ev pirjimarî têkeve ser navekî dîtir, hingê (an) tê guhertin, û dibe (ên), wek (bajarên Kurdistanê). Lê belê ev (ên) di devoka Hekarê de, dibe (êd)

wek (bajarêd Kurdistanê), û di devoka Badînanê de, dibe (êt), wek (bajarêd Kurdistanê).

Her kesê ko bi hûrbînî li Mem û Zînê vegere, dikare bibîne, ko Xanî ev her sê wêne bi kar anîne. Di malika 1067an de dibêje (zîlfêd, destêd) nabêje (zîlfên, destên), û di yek malikê de, herdu wêneyan bi kar tîne:

*Ahoye sipî, û çavêd reş bûn,
Biskên di siyah bihn di xoş bûn.*

(rûpel 129. malik: 1617)

Û di malika 1085an de dibêje (kêfêd) nabêje (kêfên) û ne jî dibêje (kêfêd).

Ev nîmûneyên jorîn didine xuyakirin, ko zimanê Xanî gelekî dewlemend e, û ji jiyana rojane ve gelekî nêzik e. Ev numande jî wek em dibînin, di ramana Xanî de nîşana du tiştên hunerî û neteweyî ye. Ji hêla hunerî ve, zindiya zimanê çîrokê teqez dîke, û ji hêla neteweyî ve jî dide xuyakirin ko şîyanên yekkirina zîmên, li nik kurdan gelek in.

Li dawiyê hêjayî gotinê ye em bibêjin, ev çîrok çîrokeke helbestî ye, ko ji 2655 malikan hatiye raxistin. Ev dirêjayî belkî karînen helbestvan, di tenga bi karanîna yek rêzbandê re qels û jar bike. Lê Xaniyê gewre çareyeke hunerî ya hêja jê re dibîne. Helbestvanên tirk û farisan destanên xwe beş-beşî dirustin, û her beşek li pêlewazekê û rêzbandeke cida siwar dikirin, da xwe ji vê astengê rizgar bikin. Lê Xanî ev destan tev li pêlewaza (Hezec) siwar kiriye, û yekemîn car bû ko di helbesta kurdî de rê li pêş hilma xwe vekirî hiştibû, û rêzband guhertibû malika (Mesnewî), ko herdu birên wê xwedan rêzbandek in, ji ya malika dîtir cida ye.



Ji Dîmenên Cenga Mezin

4



SEBRÎ BOTANÎ

Derengiya êvareke hişk û qerisî bû...Piştî şerekî demdirêj di navbera tabûra me û (...) leşkerê rûsî de teqteqa çekan hêdî hêdî xwe li kêmê da û paşê ji nişkê ve li herdu rexan şer nema.

Dengekî bilind û kirêt gewrî li xwe dirand:

- Ew çima şer sekinî? Kê sekinand? Çawa bê ragihandin sekinî?

Dengekî stûr û bilind bersiv da:

- Ev nîşana xêrê ye lo! De bila raweste, me ti dêr û mizgeft neşewitandine, me rezê Xwedê nebiriye, ji xwe dive raweste!

Herçend ji her 200 ta 230 neferên bloka me, hejmara kurdan ne ji 40 neferan bêtir bû, lê herdu deng bi kurdî bûn.

Di dinayayê de titişt wek rawestandina şerî kêfa esker xweş nake. Çimkî ta şer berdewam e û teqteq heye, kesê esker xwe mirovê li ber sekerata mirinê dibîne. Pê dihese ko ew ji bo kuşîna xwe şer dike. Lê ko şer sekiniye, yan disekine, hingê mirin yan tirsî kuştinê, ser û dilê wî berdide û ta demekê jê dûr dikeve.

Ev baweriya kesê esker e, nemaze di şerên mezin de, ta heke ew qehreman û gernas jî be. Bi vê baweriyê neferên bloka me bi giştî kêfa xwe pê xweş kirin, nemaze texmîn dikirin ko bi agehdariya herdu aliyên sekiniye. Lê ev texmîna wan şaş derket. Rastiya wê li jêr zixta sir û seqema bayê kur û berfa bi erdê ve qerisî, şer sekinî. Ji bêhêzî û şepirzebûna şervanên herdu aliyên bû, ko şer sekinî. Lê dîsan baş bû, ew sê saet bûn ko ser û guhên me ji gurmegurma

dengê topan û teqteqa mitiryaloze û tivengan hêsa bûbûn. Şorbeyeke xweş û



germ jî bilez û bez jî me re hatibû û me jî bi bayê bezê xwaribû. Ma gelo ji vê çêtir, di rewşeke wisa de dê çi hebe? Êdî her kes jî me bi paqijkirina çek û fişekên xwe û bi xwerandina laşê xwe ve mijûl mabû... Xwedayo çend xweş e ko êdî şer nebe! An jî hema zû destpê neke. Herkesî hez dikir ko bêhnêkê vesihe. Lê ne destûr hebû û ne jî ciyê vezîlandinê. Ji xwe "yasaq" jî bû ko em bostekê ji ciyê xwe dûr bikevin. Loma piraniya me ji bêçareyî, xwe di nêv wê berf û çiravê de vezîland. Lê wisa jî kêfa ragirtina şerî em germ kiribûn û navê Xwedê jî bûbû benîştê devên me, ko hema xirabtir li me neqewime... Lê heywax li me û li wê kêfa me ya derewîn! Êrîşeke rûsî di rexê me ê çepê re hat. Ne

hemû lê giraniya wê kete ser bloka me û Xwedê jî, em gorî mezinahiya navê wî, li hana me nehat.

Zabîte me yê zimanlûs qijand:

- Van gawirên pîs û bêzirav bikujin û bişînin cehenemê! Îşev şeva we ye ey qehremanên şan û şerefa dewleta Alîosman. Ji xwe berê jî tikesî guh nedida van gotinên pûç û arzan. Lê dîsan neferên blokê li gor rewşa xwe sistî nekirin û bersiva vê êrîşê jî dan. Piştî berxwedaneke kêr û sist, zabîte şan û şerefê dît her ko dem dibore êrîşa rûsan jî hêdî hêdî nêzîktir dibe, û bi me naête rawestandî. Loma wî deng li esker kir:

- Şerê xwe bidomînin! Destên xwe sivik bikin! Xuya ye ko neferên vê êrîşê, ne ew in ên ko berî nuha şerê me dikirin. Evên henê ne westiyayî ne û min nebawer e jî, ko di demeke lez û nêzîk de hanek jî me re hebe. Heke hebe jî, dê dereng bigihe. Loma heke em... Nizanim çî!

Zabitê şan û şerefê gotina xwe got û bi lez neferek pey Mişkê heftcan re rêkir.
Êdî me baş têderxist ko tirsê serî ji xwedanê şan û şerefê standiye û neşê
veşêre jî.

Nuha em werin ser Mişkê heftcan, kî ye û çî ye!

Mişkê heftcan neferekî zîrek û çavnetirs bû, di şeran de hatibû siqandin.
Ji xwe wî bi devê xwe gotibû:

- Ez ji bilî eskeriyê, bikêrî tiştêkî dî nayê. Bi rastî jî Xwedê ew ji eskeriyê re
dabû. Şarezayê çekan bû, li ser topê bû, pîvaz hûr dikirin, nanpêj bû û zabitê
xwe jî şîret dikir. Ma çî dî bêjîm? Bûbû şîretkar û şarezayê blokê... çar caran
birîndar bûbû; zik, sîng û herdu ranên wî bi fişekan hatibûn simtin û kunkun
bûbûn, lê her car fişekê tenê jî di laşê wî de nedima û derbasî rexê dî dibûn,
hestî û hinavên wî ne dihingavtin. Hekîmê taborê ji birînen wî ecêbgirtî mabû,
çimkî zû sarêj û sax dibûn, her car wêrîti û kêfxweşiya wî jî pesinandibû û bi
mistek şekrokên xweş û navê Mişkê heftcan jî xelat kiribû. Êdî ji hingê ve ev
navê spehî pêvê nûsabû û wî bi xwe jî kêf pê dihat. Mişkê heftcan gihişt û
silava eskeriyê jî ji birî nekir, her çend di wê rewşê de pêdivî jî nebû. Xwedanê
şan û şerefê gotiyê:

- Haneke me heye, lê zû nagihe. Derengiya wê ji herdu blokên dî re qenc e, lê ji
me re na. Çare çî ye? Em çî bikin ey başçawîşê delal?

- Hey çavê min, ko wisa be wek tu dibêjî, pa karê me li vir çî ye? Ya qenc ew e
ko em zû ne dereng ji vir vekişin, xwe bigihînin berbinê rexê rastê û keysê xwe
li wan xweştir bikin, mişkê heftcan got.

Em reviyar, lê reva me reveke plankirî bû, ne bê ser û ber bû. Her deh deqeyan
30 nefer bi hev re hêdî hêdî diçûn wî ciyê ko hatibû diyarkirin, ji xwe dinya
taristan bû mirov ber piyê xwe jî nedidît. Wisa jî pir mixabin, neferên êrîşa rûsî
pê hesiyar û keys û delîva revê ji me standin, berî ko em karê xwe hew bikin.
Êdî zimanê xwediyê şan û şerefê şkest. Ji şilka serê xwe ta binê piyê xwe, wek
nihikê di nêv avê de lerizî şeşşeqa diranên wî dihat bihîstin. Lê dive mirov xwe
ji Xwedê neke û hevalê xwe bi derewan riswa neke. Fehmî Efendî, ko ev navê wî
bû, ne mirovekî bêzirav bû. Ew di şer û êrîşan de tim li pêş bû û di dema rev û
vekişînê de xwe tim li paş dihişt. Mişkê heftcan jî ev dizanî, loma wî bi nermî û
dilovanî gotiyê:

- Brako çimkî tu berpîrs î, loma tu ditirsî! Ji xwe kesê di rewşeke halo de
netirse, di dinyayê de peyda nabe. Û heke hebe jî, ew kêmaqil e lê dive mirov
xwegir be û di ber tirsê re karê xwe jî bike! Kar di cengê de bêtirs nameşe...
Rewşa herdu blokên me ên dî, ne ji rewşa me çêtir bû. Lê ji sextî û asêtiya ciyê
wan, êrîşa rûsan nedişiya pêşdetir bêt. Ji xwe berê jî me dizanî ko heke êrîşa
wan neşke jî, dê di ciyekî de raweste. An jî ew bê ziyaneke mezin nagihin

armanca xwe. Herçend li hana me nehatin jî, lê topçiyê blok 2, ya ko li nêzîkî me bû, alîkariya me dikir. Wî nekêmtir ji çil berikên topan avêtibûn êrîşa li hemberî me, lê êdî wî jî ew keys nemabû û êrîşê jî nêzîkayî li ciyê me kiribû. Êdî ya ji me hat ew bû ko em torbeyên xwe ji fişekên ko di sindoqan de mabûn, dagirin û bilez birevin. Lê mixabin ev reva me bê ser û ber bû. Me bi vê reva xwe ya bilez û bê ser û ber, hevalên xwe jî, ên ko pêştir vekîşiyabûn bi xwe re bizdandin. Hindek jî belkî nû digihanê, hindek jî hêştê bi rê ve bûn û em jî direvîyan. Lê berî ko em bigihin ciyê diyarkirî, rûsan jî êrîşa xwe kiribûn du bir, an du nîv. Nîvek jê berbi wî ciyê ko em diçûnê hat û serpeşkên wê ermenî bûn. Êdî ew li me qewimî ya ko ez nizanîm behs bikim. Me rewşa şer û berxwedanê nema. Êdî her kes, an her çendekan ji neferên blokê, ji xwe re bi rexekî ve teriqîn... Tivêna fişekan bû; di ser serên me re, hem li rex û dorên me "lingo lezke bilezîne". Kî hat kuştin, kî hat birîndarkirin û kî ma zindî. Xwedê dizane! Em dişemitiyan, devdevkî û qonqonkî diketin û em naçar dibûn fişekên xwe jî biavêjin, da ko em piçekê leztir birevin... Û hevalên me ên ko berî me gîhabûn ciyê kombûnê ew jî ketibûne ber pêla wê êrîşa ko çekdarên ermenîyan rêberîya wê dikirin. Loma êdî bloka me wek blok nema û neferên wê bi giştî ji hev hatin veqetandin. Wisa şehê şerî di serê bloka me re şkest. Herçend em tibabekê dûr çûbûn jî lê hêştê dengê pismamekî me yê ermenî bi tirkî û piştire bi kurdî jî dihate guhên me.

- Nerevin lo! Hey koçikên Reşad û Hemîd! Werin ji xwe re em gawiran bikujin! Vî pismamê me gelek gotinên pîs û kirêt di derheqê van herdu sultanên de dikir. Hevalê me Mustefa Hilmî, wî jî ji rik û bêzariya xwe, "amîn amîn" digot. Vî ermeniyê malşewitî û dilperitî, wek piraniya ermenîyan belkî wî jî bawer kiribû ko em bi serên sultanên sînd dixwun. Şeva me, ji tariyê tarîtir bû. Ji ber bazdan û revê kutekuta dilên me bû. Me hew dît ko em şeş kes in; Lutfî ji Îzmîrê, Cemîlê Ebdilla ji Amêdiyê, Mustefa Hilmî ji Şamê, Cindiyê Temer ji Dihê (Eruh), Seîd Lazî ji Sînopê û ez Silêmanê Misto ji Colemêrgê. Em nizanin çi dema şevê ye lê em dizanin ko şeva me ya dimor dageryaye û hêz di me de nemaye. Me çavên xwe li bervezek zuha gerand ko piçekê me ji sermayê biparêze. Lê mixabin tat û nehitên kevrên wî çiyayî bê bervez bûn û ji xwe şkeft tunebûn, an em bi ser ve nabin. Hevalê me C. Amêdî çû li ciyekî bigere. Wî dîzek mezin ya çilo dît û hat em birinê. Me çendek ji gurzên çilo jê rakirin da em têkevin nava komê û xwe pê binuxumînin. Lê wey kulmano ezoo, ev çi ye em dibînin? Çar esker rûniştî ne, xwe bi hev ve kirine kurîşk, erzenên xwe gihandine kabokên xwe, ko me dît nalivin. Nû me zanî ko bîrs û sermayê ew kuştine. Me her çar cendek ji ciyê wan rakişandin û em daketin nava koma çilo,

ya ko bi pûş û rîsiyan hatibû raxistin û me xwe bi wan gurzên çilo nixamt.
Hêştta me ciyê xwe xweş nekirîbû, hevalê me C.Temerî got:

- Ev çi ye li kemaxa min dikeve, nahêle ez ciyê xwe xweş bikim? Cî teng e,
keysê min lê nahêt. Yek ji we destê xwe bigihîninê û bizanin çi ye?

Min destê xwe di ser pişta wî re bir gihand kemaxa wî û peland, kete ser kîsekî
dagirtî, ko min ser xwe de kêşa, hişk û giran bû. Me anî danî ber xwe. Benikê
devê kîsê zêrîn bilez me vekir û bêhna nanê genimî xwe li xinxinkên kepiyên me
xist... Ey Xwedayê pak û tak û pîroz, em şikirdarê te û vê qenciya te ne! Bîst û
sê nan, pênc serik pîvaz û tibabek mêmîjên zer û reş di kîsê mezin de bûn. Min
got kîsê zêrîn! Lê zêr çi rîx e yaboo? Bawer bikin ko hingê (li gor rewşa wê
demê) ew ji hezar kîsên tijî zêr çêtir bû. Ji nû me zanî ko xwediyên vî kîsê nanî,
ne ji nêza miribûn, belkî ji serma req bûbûn... Êdî kêf kêfa me bû, me dizanî ko
em dikarin 10-12 rojan li xwe ragirin û zindî bimînin û pê bijîn ta Xwedê
çareyekê li vî halê me dike.

Me her şeşan di wê rewşê de sê nan bi mêmîj û pîvazan xwar, Xwedê xêra wan
her çar miriyan jî binivîse. Dinya li me bû sibeh, me gurzên çilo ji ser xwe
avêtin û li hawîrdor temaşe kir. Ji nû me derdê xwe zanî; derdê windabûnê, em
nuha winda ne, rojhilat, rojava, bakur û başûr ji hev nanasin. Em nizanin bi
kîjan rexî ve herin. Çumkî hingê li hindek deveran, meydan û şergehên me û
rûsan nîşan û sînor jê re nemabûn, hemû herifî bûn...

Me bawerî bi xwe nemabû ko em bisteh bi rexekî ve biçûna. Ma gelo ew rexê
ko em bigirin, dê me berbi ordîgeheke rûsî an tirkî bibe? Em nizanin. Lê em
dizanin ko em her şeş çiyayî ne û reşatiya şevan, zehmetiya kaş û kendalên
bilind û asê nikarin me bitirsînin. Nemaze me têra xwe nanê zêrîn jî heye...



gurmêna dengê topan ji dûr dihat. Me dizanî ko herdu aliyên şerî berbi hev davêjin, lê kîjan alî tirk e û kîjan rûs e? Em nizanin! Hevalê me C. Amêdî got: Hûn li vî çiyê xwe bimînin. Ez dê hilkişim serê vî çiyayî û ji wê derê binerim ka li rexê dî çi heye? Lê bila we hay ji min hebe! Ji bîr nekin!

S. Lazî nanek sax û neşkestî ji kîskê nanî raberî Cemîlî kir. Nîvek para wî ya wê rojê û nivê dî bi diyarî mîna xelatkirinê, lê bi şertê ko ew nexwe ta digihe serê çiyayî... Cemîl nanê xwe bir û çû... S. Lazî xwe kenand û got:

- Eskerno xwelîserno, ev çi ye? Werin ji xwe re bibînin. Xuya ye ko şeva borî me nanê xwe bi goştê sipihan xwariye. Bibînin çawa bi nanî ve û dî nêv mêwîjan de dilivlivin. Me nan û mêwîjên xwe ji sipihan paqijkirin. Lê me ev ji xwe re nekir xem. Sipihan neşiyar biqasî serê mûyekî ji bihayê nanê me kêmbikin. Çumkî birçîbûnê herkes biribû ber nemanê çî esker, çî jî sîvîl. Me xwe li teniştata tatekê mit û bêdeng kiriye û çavên me ên tarî li rîya hatina. C. Amêdî ne, ka dê kengê vegere?! Hevalê me S. Lazî, rabû ser xwe û got:

- Hevalno, dîmenên kuştî û birîndaran têne xewna min û nahêlin ez razim. Ez dikim nakim, nikarim ji bîr bikim. Ma ez dê çawa ji bîr bikim? Roj di ser min re derbas nedibû ko ez termê 50 ta 100 kuştî, birîndar û miriyan nebînim. Dihate gotin ko ew neferên bi mirinê diçin, ji ên bi kuştinê bêtir in. Lê min ev gotina ha bawer nekir ta ko min bi çavê serê xwe nedît! Carekê di rêka çûna xwe de ji nik hekîmbaşî ta nik zabîtê îdarê, ko hemû du saet rê bûn, min çil û du cendek hejmartin. Ji wan tenê sêzdeh kuştî bûn. Ên dî hemû ji nêza mirî bûn, ji xwe bila em behsa kûtîbûn û sermayê nekin çêtir e. Gotinên S. Lazî ên melûl û dilşewat, li vir hew bûn.

Çûn û hatina C. Amêdî nêzî sê-çar saetan dom kir. Wî mizgîniyek da û em pê fûrandin ko çend çadir ji ên Hemîdiyan li rexê dî û li ser simên çiyayê beramber dîtine, rûnenişt, got:

- Heydê rabin em herin...

Ew diçe û em li pey wî dilezînin. Kaş û kendal in, hêrik û newal in. Mina dizan diîbitirs em diçin mêvandariya hemîdiyên, ko bi tevayî kurmanç in. Rewşa me baştir bûye. Em li teniştata tatekî rûnişt ne û nan, mêwîj û pîvazan dixwun. C. Amêdî got:

- Hevalno nalînek dête guhê min.

Me tevan guhên xwe lûç kir. Nalîneke nizim û lawaz bû, mîna ko ji bin heft tebeqên erdê derkeve. Em pê neguhişîn. Çumkî me dizanî, ko kuştî û birîndarên bêkes û bêxwedî li van çol û çiyayan hene û ev ne cara yekê jî bû, ko em dibînin. Ji xwe heke em di wê kêlikê de ne bêdeng bûna, me qet dengê wî ne

dibihîst. Tat pan û dirêj e, em li rexekî wê rûniştî ne, rexê dî tatê nagihe erdê, bilind û hildayî maye. Valahiyek çêbûye û tê de çaleke vêl heye, eniya tatê dirêj e û jê re bûye ban û bin de bûye bervez. Birîndarê me û sê kuştî ji xwe hîç, lê birîndarê me çi birîndar e? Ey Xwedayo mala te... Fîşekekê hestiyê milê wî ê rastê hûr hûr kiriye û fîşekeke dî di stûna movikên piştê wî re derbasî kemax û perasiyan bûye. Ji bil dengê nalenala wî û peyvên "Ûskûdar" û "evet" me ti tişt jê fêhm nekir. Lê wî bi îşaret û nalîna xwe got:

- Min li vir nehêlin!

Me her sê termên kuştîyan jê dûr kirin, çar nanê neşkandî di gel mistek mêwîj jê re hiştin. Cî û cilên wî jî ji xwîn zox û edavê paqij kirin û em çûn... Bi rê ve min ji hevalên xwe re got:

- Ji Xwedê bixwazin ko em bêne kuştin, lê neyêne birîndarkirin. Me çiyayê bilind paş xwe ve hişt û em daketin rexê dî. Vê çûna me pênc- şeş saetan dom kir. Li gor kulpa wê serdemê, ew dan û dikakê ko me li nik van hemîdiyan dît, heke me bi çavên xwe nedîta û kesekî dî ji me re bigota, me dê bawer nekira. Ma gelo em hişyar in an xewn e em dibînin? Garaneke dewarên reş; ga, mêga û golik. Di nêv vê garanê de tibabeke mîh, kavir, bizin û gîşk jî hebûn. Di şkefteke xweşkirî de xwarin çêdikirin, navê wê kiribûn Tekiyexana sultanî. Li tiştê wê konekî dustûnî vedabûn. Di hundurê wî de tijî têrikên dan û dikak, derfên penîr û jajî, taxeyên tûtînê û hemû cuda cuda li ser hev danîbûn. Ev çarsed-pêncsed hemîdiyên ziktêr û çavbirçî wek ko ji talankirina malê xelkê re hatibin, ne ji tiştêkî dî re. Wan ta buxçikên cil û hûrûmûrên jinan jî li xwe kom kiribûn. Vê rewşa xweş û bêrûmetî, gotineke koçerî anî bîra min: Neristî nebedayî, kûnê reş vedayî. Helbet piraniya vê bereketa sultanî ji malê xelkê pêkhatibû, nemaze yê ermen û êzîdiyan. Lê van xweşmêrên me kurdan! Ta kurdên misilman jî talan kiribûn, di nav wan de du gundiyan belengaz ji devera Sarîqamîşê bûn û daxwaza gayên xwe dikirin...

Ferhengok:

vesihe: rihet û îstîrahet

han: îmdad, de'im

hinik: darik, zilik û qirşikên ko li ser avê dilerizin

dimor: nehr

bervez: cihê zuha ko ba û barov jê nagire sitar e

kurîşk: core rûniştineke çi ji melûlî û çi jî ji tirsan e

kulp: giranî, xela cela

dan û dikak: erzaq

Aramên

çanda

xwekuj

Tu, wek germiya şevên havînê,
xewrevîn û fediyok, min bi tîrêjên
evîné hênik dikî.

Dengbêj û nêçîrvanên herêmî, ketine ser
şopa evîna min û te, bûne rêberên
evînfiroşan.

Lê ew ji bîr dikin ko ez û tu di destpeka
nivê dîroka kambax û malwêran de, bûne
wek Memo û Zîné.

Ne bi hev û ne jî bêyî hev em dikarin bijîn.
Dê çawa be?

Hişyarbûna me ya dawîn, bêhişiya me ya
pêşîn wenda nake,
pezên me li zozanên xemilandî belav nake.
Ne lorînên dengbejên herêmî, ne tîrêjên
evîné û ne jî xunava biharê dikarin dilên me
yên xemgîn şa bikin.

Govendgirtina me ya li ber kalîna pezên me
yên candayî, xemgîniya me ya ko bi tîrêjên
evîné hênik dibe, .. êdî nema bikêr tên..

Pezê me yê candayî bi can nakin û zozanan
ji nû ve bi ber nakin.

Erê dapîra kul û kederan!

Di berbangên biharê de, beşdarbûna
kerwanên rêsîvanan; vexwarina ava "eyarên
pezên giroyî û guhdarkirina dengbêjên
bênav ên çanda nemir radestî me dikirin,
bûne xewnên bê xeyal.

Herweha îro jî "nobedarên azadiyê" û
"rêberên" pêşeroja min û te, yeko yeko,
dikevin dora xwerêdanên bi nêçîrvanê evîna
min û te re.

Ew bi dîrokên xwe yên paşerojê sergêj bûne, nizanin ji ku hatine
û diçin kuderê.

Lê herweha dengê te yê zelal û lal jî qurmiçandine.
Divê ez û tu careke din hişyar bibin û ji xewa bê xewn
rabin.

Careke din wek hespên kihêl di destpêka biharê de gewî û bi
çargav ber bi doza xwe ve birevin, doza evina min û te.

Ma nebes e lê!

Ey dapîra kul û kederan!

Bi koçbariya mamostayê hêviya evînê, zozanên koçeriyê bûne
qada xwînbariyê. Sînga te ya kaniya gul û beybûnan, ji mizdarî û
maç û ramîsanên xwînaxwaran, bê bîn maye û ji xemla xwe ketiye.
Hêviya evîna mamostayê min û te, di nav lepên hunermendên
xwekujiyê de, pepûk û bêçare maye

Yek ber bi rojava û yek jî ber bi rojhilat ve dikişîne.

Ew jî ji derd û kulên bêhişiyê dihele û ji taqet dikeve û nikare xwe
ji nav destên xwekujiyên zîrek azad bike.

Di gergerîneka Labîrênta lîstika veşartokê de, ne tenê min û te
riyên xwe şaş kirine, herweha yên din jî ketine leca dest ji
berdanên hunermendiyên mamoste yên bi şewat û wêrankirina
hêviyên salan û ên bi xwêdana eniyan û bi hêsirbarînen bêçare û
bi hawar û qîrînen

zarok û dayekên di

alavên

ragihandinê de

yên sedsala

bîstan; wek

wêneyên serdemî

dihatin weşandin,

hatibûn avakirin.

Li der û dora me

binêre!



Şagirtên mamoste jî yeko yeko beşdariî leca veşartokê dibin û di
labîrênta bê rê de xwe ji asoyên sayî ber bi asoyên bi mij ve
dikişînin û dibin xwedanên desthilatîyên çavsoriya diji hêviyên
baranbarîna guneh şûştinê.

Tu ey dapîra kederan!

tu hiş û ramanên xwe ji ku digrî?

Tu ji bo çi wek mirîşka kurk ketî, bi ser hêviyên xwe de diponijî!

Bo çi carekê ji ser hêviyên xwe ranabî û nakî qîrîn?!

Ji bo çi carekê dengê te yê xemgîn û bi şewat nakeve kerîneka
guhên" serkêşên" hêviyên min û te?

Tu ji bo çi, desthilatiyên xwe yên dapîrî bi kar nayînî?

Ma tu nikarî belavkirina mîrata bav û kalan rawestîni ta ko
berbang bê û ezman sayî bibe.

Ma tu nizanî, ko têkçûna şopên rêçika baweriyên mamoste,
serberjêrkirina hêviyên min û te bi xwe re tîne.

Bawerî û ramanên serjêkirî, dem û xewnên bêçare
diafirînin û rê û rêçên derketina ji labîrênta bêdawî tevlihev dikin
û agahdariyên peywendiyên evîna jîndar diqurmiçînin.

Ka were li ber serê min ê gêj û bêxeyalmayî rûnê û çîrokên evînê
ji min ra dûbare bike.

De were ji nû ve dest bi avakirina hêviyên xwe yên wendabûyî
bike û min jî di hêlana xewn û xeyalên xwe de bihejîne.

Ez derd û kulên te dizanim.

Êdi tu naxwazî rûpelên ferhenga lorînan vekî!!?

Tu taqeta

xewndîtinê û
avakirina xeyalên
wendabûyî di
xwe de nabînî.

De ka were!

Careke din
hunermendiya
xwe eşkere bike.

Hunera

dartewandinê di

ware hûnandina xewn û xeyalan de jî eşkere bike.

Şagirtên di şopa peyarêka mamosteyên min û te de, westayî û
mayî ketin e, wek weşandina darê wan hilweşîne û helwestên
hozanên hêviyan radestî wan bike.

Ev ne hewldana yekem e û ne ji ya dawîn e!



Hewildanên piştgirtina pevçûn û tawanbariya destberdanên ji daristanên pezkovîyan û ji heyamên kuştina bêhêviyan, ne karên min û te ne.

Heyamên serjêkirina bêhêviyan, aramên çanda dîroka serbilind û payedar e. Avakirina heyamên kuştina bêhêviyan, raperînê, ji nava diroka kambax, ji sînga zozanên wêranbûyi û ji hunermendiya hêza zimên, wek zayîna demê, wek derketina rojê û wek vebûna gulê, derdixîne.

Ger ez û tu, li ser rê û rêçên kevnare yên ko me di demên paşerojê de, wek pêwistiyên hêviyên Jiyana berhemdar rê didan û dikirin destûra evîna xewnan, bi rê ve biçin emê rêberî gelek kelemên tûj û çiyayên asê bibin.

Emê nikaribin rojeva pêwistiyên jiyaneke azad bi çavgirtokên veşartoka labîrênta bêdawî peyda bikin û emê nikaribin rojeva pêwistiyên bikin qada bawerî û hêviya xewnên mamostayê min û te.

Divê ez û tu îro, wek xortine xemkûjîn bipijiqin ser çavên bêdûrbîn ko li termên hêviyên bav û kalan dilikumin û nabînin.

Dahfikên ko bi çavkorî têne vedan, dahfikvedanên bi zanyarî û bi bawerî bi xwera tîne.

Serencamên dahfikvedanên zanyarî kuştina axa gorra min û te ye.



Dest ji ber xwe bernede, û nebe xwedanê kuştina zayîna demê.

Ko ez û tu wek bav û kalên xwe nekevin sînga hev û stûna xaniyên hev ji bin hîmê avahiyan nekişînin, dê dem berhemdar be.

Ji bîr neke ko berhemdariya demê şabûna min û te ye û serencama bi cî anîna sozên me ne; sozên ko min û te di destpeka evîna xwe de radestî mamosteyê xwe kiribûn.

Gulebarînên te wek tîrêjên awirên evînkuj û wek zîpika destpêka payîzê, min diêşînin. Destbiratiya di destpêka xûnava bihara rengîn de ya ko bi tîrkevanên kuştina xem û derdan hatibû hûnandin yeko yeko têk diçin.

Bihara min û te wek xunava evînê li ser darên bê pel, li ser avahiyên wêran û li ser destên hunermendên xwekujiyê dihele û xwe dighîne ava çemê hêsiran.

Riya me ya ko em jê hatine û ya ko em pê da diçin glover û serberjêr e.

Îro bûye bela serê me.

Ketiye nav lep û lingên me.

Serê xwe bilind ke û bibîne.

Ka dilê te û devê te li hev dikin.

Dîmenên evînê radestî yên din dikin. Bizanibel!

Kilamên me ji bo dilgirtina mirovên evindar in. Bibîne!

Berbang mizgîniya destpêkirin û avakirina hêviyên mamosteyan radestî me dike. Û me gelek kilam û lorînên evînê jî ji hev re gotin.

Kilama min û te bi dawî nayê.

Serê xwe neêşîne û menale.

Diroka cîhanê; cîhana bê nav û bê deng, di nav lêvên te yên qermiçî û tî de, bûye benîştê qizwanê yê darên bê tam û bê ber.

Were destê xwe bide destê min û dîroka sosretan, Dîroka hesretan,

Hesretên bê hejmar

Bê dawî

Bê serî. Ji min re bilorîne.

Lorînên xeyalane

Wek çirokên pirevokan, di xewnên zaroktiya min de Difirin,

Dikevin,

Diteqin. Û

Li hawirdor belav dibin,

Sergêj û bê çar e.

NEZÎR AKAT



REZOYÊ OSÊ

*Ji
pirtûka
xilmaşiyê*

Çavpêvedan

1

Me
Nivişt
pêçan...
Berbejin
bi
bejnan de
berdan
û
bazbend
hilgirtin,
hilênan.

2

Me
Nal
bi
devê deriyan
ve
kutan...
Simê pêz
daleqandin
û lepên xwînê
li
wan
dan...

3

Me
şînok
Hîro
Bi eniyan
Ve
kirin
Qespik
û
şeytanok
bi
kumikên
zarokan ve
şêlan...

4

Tiştêkî
em
ji
çavên
pîpoqî
ne
parastin
ne
hêlan.

05.01.94

Tilihên dest

Me
tilihên xwe
jimartin:
Vê, got:
da'm herin
diziyê...
Vê, got:
de...
Vê, got:
ku
û
ta...
Vê, got:
ez
şehde...
Vê, got:
Pîr im,
Qut im
na
gihime
hevala!

05.01.94

Kêzka Zêrîn

Me
Kêzka Zêrîn
anî...
hêdîka
I'
ber xwe
danî...
Me bakiryê:
Qoplanî...
Moplanî...
Kêzê
perek hilanî
yê dî
pê re
bir
banî,
got:
Kêz firî
ma
"kompanî"!.
06.01.94

Dilşikestin

1
Nanê min
di
tenûra tox
û
sar de
bû kûmir.

2
Bexê min
di
mêrg û
çîmenan de

noq da

3

Cama dilê
min
Dî şerê
kezîzeran de
şikest.
07.01.94

Jiyan


Çêleka me
kayîna xwe
dîke...
Aşê me
kevîrê xwe
dihêre
û
keraxê me
bî
devê tevşoyê
xwe
hêdî hêdî
axa
dora
mêwa
tirihdayî
dixepêre.

15.01.94

Kuftik

Me
kuftka xwe
hilda
ker hat...
Me
avêt
diz hat...
Me
werand
sofi hat...
Hembervanê
me,
destegul
qot rakir...
hilda
mîr anî...
avêt
mîrê mîra
anî...
Em mane
li
xwar...
Ew ma
li
banî.

16.01.94



BAXÊ GULAN

Bi gulekê bihar nabe

1

Carekê, li herêmekê gulistanek hebû. Bi gul û çîçekên sor, zer û spî wek sosin, nêrgiz, benefş, şilêr û şahgulan, hatibû xemilandin.

Vêga, çîçeka sosinê ji nêrgizê re got:

- Bedewiya vê gulistanê hemî bi saya min e.

Çîçeka nêrgizê lêvegerand û got:

- Ev zîbayî ne ya te tenê ye, hemî gul û çîçekên din di dirustkirina vê xweşikiyê de hevpar in. Ji bo çi tu qenciya mirovên cotkar ên ko qadê dirg dikin û dajon û ji gîhayên ziyandar paqij dikin, winda dikî?

Çima tu mafê co û cobaran ji bîr dikî? Eger ew nehatana nava gulistanê dê zevî hişk û zuha bimana û em jî der nediketin, geş nedibûn.

Paşê ma kanî mafên tîrêjên rojê, mane ko tunebana dê ev gîha û ev jiyana ji binî ve tunebana.

Mebesta min ji vê çîrokê ew e, ez dixwazim mîletê me nas bike, ko kesk û dukes û sêkes nikarin tutîştî bikin. Dive mîletê me hemî wek bira destan bidin hev û têkevin newça têkoşinê.



RÊWÎ

ZEWACA REŞ A GULİZARÊ

Malmîsanij

"Gulê digo
Hecî Mûsa Bego qurban, ez-gune
me,
ez-gune me
Ez axçîk im, ez file me
Ez pûlik im, bêfayde me
Ez ne liyaqê Hecî Mûsa Begê xwe
me
Gulê digo Hecî Mûsa Bego qurban,
tu min serjêkî bi dûzanan
Tu goştê min rakî bi kelbetanan
Ez tu car nayê m ser dînê
musulmanan
Gulê digo Hecî Mûsa Bego qurban,
ez Gulê me, Gula dîn im
Ezê rabim dawa xwe li nava
xwebilefînim
Rêka Istanbûla şewitî bigirim,
bikudînim
Ezê textê Sultan Reşad bigirim,
bihejînim
Ezê heft diwêlê ecnebî bi xwe
û Hecî Mûsa Begê bihesînim"



Berga kitêba
Arménouhie
Kévonian, Les
Noces Noires De
Gulizar, Éditions
Parentheses,
1993, 166r.

Gulîzara keça Axacan Egop ko ez dixwazim li vira behsa wê bikim, di wexta xwe de di nav kurdan de bi navê Gulê navdar bû. Di 1889'an de, yanê sed û heşt sal berê Mûsa Begê lawê Mîrza Beg şevê sed û pêncî merivên xwe şandine ser gundekî Êrmenîyan, Xartzeyê. Xartze di navbera Mûş û Exlatê de, li deşta Mûşê bû. Merivên Mûsa Beg di tarîya şevê de avêtin ser gund, tîfing bera wan dan, li wan xistin, hinek birîndar kirin, malên wan talan kirin û Gulîzar jî revandin birin teslîmî Mûsa Begî kirin. Ji birîndarên êrmenîyan çend kes wê şevê mirin.

Berî vê hedîseyê jî Mûsa Begî tahde li êrmenîyan dikir. Ji ber vê tahdeyê, ji êrmenîyan Ohan û apê Gulê, Mîhran (Mîro) gilîyê Mûsa Begî li hukmatê kiribûn. Piştî vê gilîkirinê, Mûsa Beg şevê Ohanî dişewitîne dikuje. Wexta ko wê direvînin, Gulê hê keçeka çarde salî bûye. Piştî revandinê, merivên Mûsa Begî wê teslîmî wî dikin. Her çendî ew digrî û dixwaze ko wê berdî, lê çî fayde ko Mûsa Beg wê bernade û dixwaze pê re bizewice. Digel ko Mûsa Beg xwedîyê çar jinan bû jî, dixwest vê keçika tern û ciwan jî bi zorê bigire.

Gulê keçeka bi rik û qerardar bû, Mûsa dike nake ew naxwaze. Mûsa dixwaze ko ew bibe misilman jî. "Ez" dibêje Gulê, "heke ez sed sal jî li ba te bimînim, ez êrmenî [xiristyan] me. Tu dixwazî min bi saxî bişewitîne ..."

Rojekê apê Mûsa Begî Mihemed dibêje "Mûsa, çar jinên te hene. Ev keçika ji te re ne minasib e. Wê bide birayê xwe Cezayîrî." Lêbelê Mûsa qebûl nake. Dawîya dawî Şêxê Kufra û eşîra Belekân dikevin nav meselê û Mûsa Begî razî dikin daku ew Gulê bide birayê xwe Cezayîrî.



Hecî Mûsa Beg

Gulê bi zorê didin Cezayirî. Nêzî sê mehan li cem wî dimîne. Dibe jina wî. Zaf ezîyetê dibîne. Him maddî û him jî psîkolojîk. De hesab bikin ko ew keçika tern û ciwan bi zorê revandiye, ji xwe re kiriye jin, tahde lê kiriye û bi ser de dixwaze wê bi zorê bike musulman. Heta navê wê jî guhertiye, kiriye Fatma.

Mesela Gulê dûr û dirêj e. Pişt re merivên Gulê gilîyê Mûsa Begî û birayê wî Cezayirî li hukmatê kirin. Mesele gehişt Îstenbolê jî. Hinek êrmeniyên Îstenbolê li Gulê xwedî derketin. Ji aliyekî jî hinek elçî û temsîlkarên dewletên Ewropa li ser vê meselê rawestiyan. Welê bû ko dawîyê walîyê Bedlîsê jî li ser meselê rawestiya û xwest ko Gulê biçê Bedlîsê, mahkemê. Cezayir naxwaze Gulê bişîne, lêbelê Gulê taktîka xwe diguherîne û Cezayirî dixapîne, dibêje heke ez biçim mahkemeyê jî ez dev ji te bernadim. Ez êdî ji te hez dikim, ez jina te me û ez bi dilê xwe li cem te dişekinim, ne bi zorê. Ez êdî musulman im. Heke ez biçim mahkemeyê jî ezê îfadeya xwe wenî bidim.

Piştî vê yekê, ew Gulê dişîne mahkemeya Bedlîsê. Li wir Gulê çî di dilê wê de heye wê dibêje. Yanî rastîyê dibêje, dibêje ko wan ez bi zorê revandim, ez Cezayirî naxwazim, ez dixwazim ko hûn min teslîmî diya min bikin. Mahkeme mecbûr dimîne, wê teslîmî diya wê dikan.

Piştî demekê li Îstenbolê jî mehkeme vedibe. Gulê diçe Îstenbolê. Di 26'ê Hezîrana 1889'an de Mûsa Beg jî diçe Îstenbolê, li wir mahkeme dibe. Pêşî mahkeme nikane sûcê wî tesbît bike, ji ber wê jî cezê naxwe, lê belê bi alîkariya êrmeniyên Îstenbolê Gulê ji nû ve lê gilî dike. Mehkemeya Gulê û Mûsa Begî sê salan diajo, di pey re hukmat cezayê surgûnîyê dide Mûsa Begî û wî surgûnî Mekkeyê dikan. Mûsa Beg di nav kurdan de bêtir bi navê Hecî Mûsa Beg tê naskirin. Welê tê fêm kirin ko piştî ko surgûnî Mekkeyê dibe, dibe hecî. Hecî Mûsa Beg salekê li Mekkeyê li surgûnîyê dimîne û paşê vedigere welêt.

Cezayir jî du salan di hefsa Mûşê de dimîne û li wir dimire.

Di pey mahkemeya Îstenbolê re Gulê vedigere Mûşê û bi Kêram der Garabêdyanî re dizewice.

Di 1908'an de Kêram dibe mebûsê Meclîsa Dewleta Osmanîyan. Ji Kêram û Gulê re keçek çêdibe: Arménouhie Kévonian, Arménouhie ko mezin dibe, dibe nivîskar û rojek tê ew bîranînên diya xwe Gulîzarê (Gulê) dinivîse. Bîranînên Gulîzarê bi ermenîkî di 1946'an de li Parîsê çap dibin. Di 1993'an de wergera fransî ya van bîranînan derket. Agahdariyên ko min li jorê dane, min ji vê kitêba fransî girtine. Bêguman agahdariyên ko min dane kurt in, lê kesê ko bixwaze di vî warî de bêtir agahdar be, divê ko vê kitêbê bixwîne.

Gulê di bîranînên xwe de behsa Behrî Paşayekî dike ko li Îstenbolê alîkarîya Mûsa Begî kiriye. Li hin ciyan dibêje "son oncle Bahri Pacha", yanî "apê xwe" (yan jî "xalê xwe"), li hin ciyan jî dibêje "proche parent de Moussa bek" "merivê Mûsa Begî yê nêzîk". Ez ne emîn im, lê îhtîmal heye ko ev kes Behrî Paşa yê Bedirxanî be. Her wisan behsa Kamil Begekî jî dike û dibêje merivê Mûsa Begî ye. Li vir jî Kamil Bedirxan tê bîra min, lêbelê ev tenê texmînek e.


Meseleya Gulê û Mûsa Begî di wexta xwe de gelek deng dabû. Hinek rojnameyên êrmenî û ewropîyan jî li ser vê meselê nivîsibûn. Bi piştgirîya ewropîyan li ser vê meseleyê gelek propaganda kiribûn. Tiştêkî din ê balkêş jî ew e ko him fotografê Mûsa Begî û him jî yê Gulîzarê wek kartpostal derketibû. Di binê fotografê Mûsa Begî de, ko di 1895'an de hatiye kişandin, nivîsîne "esilzadeyê kurd" (kurdish noble). Ji ber ko di bin fotograf de navê wî nehatiye nivîsîn, zaf kesî nezaniye ko ew Mûsa Beg e.

Gulê di bîranînên xwe de dibêje "Fotografê min û diya min ko me bi kincên millî kişandibû, li Îstenbolê bi mecîdiyekê dihat firotin..." Divê ez vê yekê jî bibêjim ko kitêb ji devê Gulîzarê ji nû ve hatiye nivîsîn û di gelek ciyan de bi gotinên heqaretî behsa Mûsa Begî dike. Ne tenê behsa Mûsa Begî, her weha di gelek ciyan de dîsa bi wan gotinên nebaş behsa kurdan dike. Wek nimûne, di ciyekî de gava ko behsa Mûsa Begî dike, dibêje "ew kûçika". Di gelek ciyan de jî kurdan re jî dibêje heydût, keleş yan jî diz.

Bêguman mirov fam dike ji ber ko gelek tahde û neheqî ji wan dîtine, loma li hember Mûsa û Cezayîrî (ew dibêje Cazo) gelek bi kîn in (apê Gulê jî bi destê merivekî Mûsa Begî hatiye kuştin). Di vî warî de heta dereceyekê "heqê" wê hebe jî kurd hemû ne layiqî van sifetên xerab in.

Tiştêkî din î balkêş jî ew e ko meseleya Gulê û Mûsa Begî bûye stran (kilam). Di vê strana kurmancî de neheqîya ko li Gulê hatiye kirin jî tê îfade kirin. Varyanteke vê kilamê jî Nacî Kutlay, nivîsiye:

"Wayê, wayê, wayê, wayê
Berf dibare tevî bayê
Wayê, wayê, wayê, wayê
Ez Gulo me, ez Gulo me, Gula dîn im
Dawa dêrê tevî delmê xwe diwalînim
Ez rêga Estenbolê bigrim biqedînim
Ezê destê xwe bavêjim textûpayê Siltan Evdilhemîd bihejnim
Ege halê min pirsîye xwe li pirsî
Ege halê min nepirsî
Ezê duwanzde duwelê xaçparêsa, heqê dînê xwe da pêhesinim



Wayê, wayê, wayê, wayê
Gulê têye ji Xarpêtê, ji nav aşa
Tilî-pêçiyê Gulê mêze dikî ji gustîl û ji hûr qaşa
Wayê, wayê, wayê, wayê
Gulo digo, Hecî Mûsa min nekuje, ez gune me
Wele ez aşiqê dinê xwe me
Tu kurmanc î, ez fille me
Wayê, wayê, wayê, wayê
Hecî Mûsa tu goştê min bidî ber kerpetana
Tu serê min kur kî bi gûzana
Ez serê xwe nadime ser balgîngê mêrê musulmana"

Bî awayê ko Dr. Nacî Kutlay dinivîse (1), Av. Dr. Canîp Yıldırım dema ko piştî salên 1950'yî li Fransayê li ser doktoraya xwe ya hiqûqê xebitiye, rojekê li hevalekî xwe yî êrmenî bûye mîvan. Jineke pîr jî li wê malê bûye. Ew jinik dibêje "Ez Gulê ya jina Hecî Mûsa Begî me". Li gor nivîsa nevîya Gulê, Anahîde Ter Minassian, keca Gulê Arménouhie Kévonian ji şêst salî zêdetir e ko li Parîse dimîne. Em Gulê li wir bihêlin. Lê çî bi serê Hecî Mûsa Begî de hat? Meseleya wî jî ji çend alîyan ve balkêş e. Hecî Mûsa Begî di 1924'an de endamê Azadîyê (li gor hinan Civata Xweserîya Kurd) bû. Piştî serihildana Şêx Seîd karbidestên Tirkîyê di 1925'an de ew sirgûnî bajarê Aydinê kirin. Ew jî ji wir reviya çû Sûrîyê. Li Sûrîyê bû endamê Xoybûnê. Gava ko serihildana Agrîyê dest pêkir, Xoybûnê xwest ko wî û Kor Huseyn Paşayî bişînin Agrîyê. Dema ko xwestiştî vegerin welêt biçin Agrîyê, Îngilîzan ew li Mûsilê girtin û bi paş de şandin Sûrîyê. Hecî Mûsa Begî li wir wefat kir (2). Wenî fêm dibê ko Hecî Mûsa Begî di salên dawîn yê tenemê xwe de êdî ne Mûsa Begê berê bû, hatîbû guhertin. Lê tiştê ko bûbû, êdî çûbû.


(1) Nacî Kutlay, "Hecî Mûsa Beg û Guloya Ermenî", Wan (kovara Yekîtîya Nivîskarên Kurd), Stockholm, no: 4 (1992), r. 3-5

(2) Di vî warî de ji bo zêdetir agahdarî, binêre: Malmîsanîj, Saîd-î Nûrsî ve Kûrt Sorunu, Doz Yayınlar, İstanbul, 1991, r. 94-96


Ev nivîsa jorîn ji Vate (kovara kulturî), Stockholm, no: 2 (1997), r. 95-100 hatiye girtin. Guheztina ji Kirdkî (Dimilî): M. Lewendî

Helbestek û heft cîgeh
ALBERTO GIACOMETTI

**Du pencereyên
zêrîn**



**Dilopeke
xwîn**



**Deşta
dînbûna zer**



**Loleyeke
xelatê,
spî,
li ser du
memikan**

3ê hespên reş dibezin

**Lingên kursiyan
dişikin
ji nişkê ve
dibin sedemê
xirecirê**

**Hemî pêdivî dût ketin.
Gurmîna gavên jinekê,
û dengvedana kenê wê
xatir ji guh dixwazin.**

LÊVÊN BIRÎNÊ

En. Ferhadê Içmo

Ezê navê te deynim, li ser lêvên birînê
Li ser dêmên êpa dil, bi rondikên tev xwînê
Sûnda mi b' navê te ye, ne bi tîpên yasîné
Hêviya min dîtna te ye, heta roja terqînê


Heger rokê nebînim, dîlana herdû çava
Dilkê reben xemgîn e, li hêviya silava
Cîhan li min tarî ye, hêvî ketin nav dava
Ma ne bes e ji te kîn, Xwedêyo malî ava

Bila cîhan bi carek, li serê min bibe yek
Bên hawar û gaziya wa, leþkerên çerxa felek
Îzraîl li pêþiya wa, bibe þah û sermelek
Ezê bêjim herbijî, du çavên mest û belek

Va ye qumrî dixwînin, li bin siya ala te
Sitêr dîsa dirêsin, li dor bejn û bala te
Evîndarên *Roja Nû*, dil ketine xala te
Sed pîroz be li zozan, agirê sersala te

22. 12. 1995

Hûn dikarin li ser navnîşana Dugirê bixwazin!



EL CEDEL

Bi zimanê Erebî.

Kovara demsalane ya pirsgrêkên raman û çanda kurdî.

Şerefname bi kurmancî derket!

ŞEREFNAME

3 Tarixa Kurdistanê ya kevn



Şerefxanê Bedlîsî


Hûn dikarin ji navnişana jêrîn bixwazin:

Weşanên Apec

Box:3318


163 03 Spånga/Sweden

Tel:46-8-761 81 18 * Fax:46-761 24 90



DUGIR *Kurdisk litteratur tidskrift*

Box 3437, S- 165 23 Hässelby - Sweden



Mihemed Sêxo

De rabe dengbêjo, de çemên dengê xwe bi ser axîna birîndaran ve biçemîne û bejinbilindahiya sirûdên şîniyê di asoyên şewata çiyân û kulîlkan de daçikîne û mîna zindiyekî dastanbêj ber bi êvarên mirinan ve sernişîv bibe.

De ji ser piştâ hespê xatirxwestinê dakeve, de nav di evîna xwe bide û kulîlkên çavqerimî yên Qamişloka giryanê; hema carekê, bi dilovaniya destên xwe şa bike.

De dengbêjo deee!

Stran zuha dibin û gula te, gula ko te nedida bi malê dinyayê, di xirecira rolan de, di navpêketina navan de, di tengerê û xaçerêkên êl û beşan de, zuha dibe..

Lê dîsa jî, sîberên dengê te ji pey xewnê venagerin û benefşên bihara dilê de li ser lêvên berbangê direqisin û çêregehên evîna te bi stêrkên bîranînê dixemilin.

Lê dîsa jî, lerza me wek derza giyanê te, di şeva çavên welatekî şêrîn de, di gel kelekên heyveronê, hînî bend û nalîna pêlan dibin.

Asoyên mirina te dengbêjo, wek mirina me, bi serpehatiyên pinpinikan di ser dev re diçin, bêrîkirin jî tawanbarî ye û dilê te jî bi me neşewitî.